



MOLEŶ XMEŶDINE

NOTÊN XWENDINÊ

Dilşêr Bêwar

Dilşêr Bêwar, di sala 1977 an da li gundê Qelêçî ya girêdayî navçeya Tatosê hatiye dinyê. Dibistana seratayî li gund, a navîn li Tatosê û lîse sala yekem li Erziromê, du salên mayîn li Tatosê xwendiyê. Ji sala '97an heta '08 an li Îzmirê jiyaye û pişt ra çûye Stenbolê. Dilşêr navê wî yê resen e. Karkerê însaatê ye. Di hin kovar û malperan da helbest, çîrok û rexne/krîtîkên wî weşiyane. Ev berhema dijîtal berhema wî ya yekem e û ji nivîsên wî yên di kovar û malperan da weşiyayî pêk tê.

NOTÊN XWENDINÊ

Dilşêr Bêwar

Adar 2020

"GOTIN 'EDET E, JÊNEXWARIN SERBESTE."

Naverok:

1. Ez û xwendina kurmancî
2. Li ser romana "Hurcahil" çend not
3. Labîrenta Cinan
4. 99 Morîkên Belavbûyî
5. Tesaduf-Rasthatinî "Marîa Melekek bû"
6. Mîrname
7. Çîrokek gewre "Xadim"
8. Kevoka Spî û Romansek Çilmisî
9. Nîşeyên Derheqê Gerîneka Guernîkayê de
10. Dewrêşê Evdî & Kulfîlka Bilbizêk û Rîm
11. Li Peravên Torê Torên Evînê
12. Aporîa: Galegala binhişî a bê ser û ber.
13. Perde romanek bajariye
14. Misyek Jiyan
15. Amîdabad
16. Xewneke Payîzê
17. Roman-çîrok a di bin baskê wezîfedariyê de fetisî
18. Dilya û Zalar
19. Her rû bi qasî qilêra xwe spî ye.

EZ Û XWENDINA KURMANCÎ

Wexta nûçe/reklama antolojiyên dengbêj Reso û Şakiro li medya civakî berbelav bû ji kêfxweşiya min re payan tune bû. Ji bo kêliyêk beriya kêliyê antolojiyan bi dest bixim diqirqilim. Roja Pêşangeha Pirtûkan a Stenbolê derî dan serpişt min xwe li ber standa Weşanxaneyê Nûbiharê dît. Bêpirs min rahişt her du antolojiyan bi bihîstina buhayê antolojiyan re kêf li min bû du qat. Antolojiyan di çenteyê de cih li xwe xweş kirin. Li mal û di rêya çûn û hatina kar de qelem û antolojî ji destên min neketin. Piştî xwendina antolojiya dengbêj Şakiro qediya min xwest hîn nîşeyan lê bikim leq bi tiliyên min û bişkokên klavyê neketin. Min jî berê xwe da antolojiya dengbêj Reso...

Îro dema çavê min bi nivîsa Cemil Oguz ket. (Hin çalakiyên kurdan ku nakevin serê min*) Min got, Dilo de keremke kula xwe birêj. Ez bawerim hewce nake dû dirêj behsa deryaya dengbêj û dengbêjiyê bikim. Bawerim heta deng li rû dinê hebe wê di şevên tarî de pêşiya me ronî bike meşhelaya dengbêjiyê.

Her çi qas gengeşî û nirxandinên niviskî li ser dengbêj û dengbêjiyê kêmbin jî awayek ji awayan mijar her zindî maye li nav civakê. Civaka heyî her çi qas qedir dabe deng jî dengbêj û dengbêjî bi awayek neyênî pênasekiriye/dike. Sedem jî kilamên li ser evîne ne. Gotina meşhûr jî doxinsistî ye. Çi civaka nexwende çi kesên bi siyaset û edebiyatê re bilîne zêde serê xwe bi mijarê re neêşandine. Bê ku bav û kalên xwe û şert û mercên lê jiyane binasên bi awayek ezberê ji ber xwe ve qelaştine/diqelêşînin. Di şertên qîz û xort bi destê dê û bav xwe bê ku çi difikirin çi dixwazin were pirsîn hatine zewicandin de dengbêj û dengbêjî bûye neynik li rûyê civakê. Li orta civatê bêtirs kalyaye, nalyaye bi wê jî nesekiniye sehneyên pevşabûnê li dar xistiye di cimaeta jin û mêr, kal û pîr, qîz û xort û zar û zêç lê hazir in. Ev sekna pola a rexnekar çawa dibe doxinsistî? Civaka ji bo çilkek xwîne qiyamet rakiriye mêr, jin... kuştiye lê bi bêhnfirehî hiştiye "doxinsistî"! gotina xwe bi serbestî birêse ew paşverû ne an kesên xwedî etîket? Di kilama Dewrêşê Evdî de Evdoyê Hîzoî (bavê Derwêş) bi devê dengbêj wiha di ser Mîrê Mîlan de dike qêrîn: "...tu rabe bîst û çar saetan têke sere êl û eşîra xwe cuhurê di hespane.." ** Bawerim ev mînak tenê ji bo wêrekiya rexnekariya dengbêjî yê besî her tiştî ye.

Di dema xwendinê de di nav rîsteyan de rastî gelek peyvên bi tirkî hatim. "bêşincî mezheb, yanax, adres, otirmiş, bacî, bekle, çamaşir, qawirme, yamacê, say dikim, yaşlı, spî beyaz,..hwd. *** Bawerim hemwateyên van peyvên û yên din têra xwe di kurdî de hene û dengbêj ji min çêtir jî dizanin. Şakiro bi çi niyetê bikaranîne ez nizanîm. Ji roja min dest bi xwendina antolojiyê kiriyê



vir ve ev pirs dev ji min bernade. Gelo kula "asîmîlasyonê û otoasîmîlasyonê" cara pêşî bi destê hunermend û dengbêjan li me geriya? Bawerim ev pirs hêjayî lêkolînê ye. Hêvîdarim akademîsyen û lêkolîner rojek berê xwe wê bidin edebiyata devkî û gelek tiştan ji hev veçirinin.

* Hin çalakiyên kurdan ku nakevin serê min

<http://diyarname.com/article.php?Idx=6370>

**cuhur: çewalê ku bi piranî bi ka û ceh dadigirin û dixin stûyê hespan ji bo xwarinê.

*** Antolojiya Dengbêjan 2 Dengbêj Şakiro. Weşanên Nûbihar.

02 12 2018

LI SER ROMANA "HURCAHIL" ÇEND NOT

“Hurcahil” navê 6’emîn (‘Ji nû ve Gîtara Bêtel’ herçiqas çapa duyem a Gîtara Bêtel be jî romanek nû ye) romana Cîhan roj e. Roman ji 88 rûpelan pêk tê. Hurcahil cêribandinek nû ye di qada romanivîsiya kurmancî de. Hem dişibe romanên Cîhan Roj, hem naşibe. Roman bi vegotinek parçeyî yê pevgerêdayî bi gewde bûye. Mekan Amed û Mûş e.

Kitêb bi tabloyan neqîşî ye, bi gotinek dîtir tablo li bin guhê hev dikevin. Pirtûk di dilê xwe yê kaotîk de îro û do dihebîne û tîrojê li sibê direşîne. Bi herikîna rûpelan re karnavalek rengîn pêk tê; heyata gund û jiyana modern a bajarî û çanda folklorîk û medya civakî mil bi mil govendê digerin. Roj, civaknasî, derûnî-psîkolojî û folklor ji xwe re kiriye bender. Bandora desthilatdarî, axê, civak û dewletê-dagirkeriyê ya li ser derûniya takekes bê ku dersê bide li ber çavan radixine. Du mexdûriyet derdikevin pêş: Jin û zarok. Romanên Roj, di heman demê de belgeyên tarîxa îroyîn û metnên edebî ne. Taybetmendiyek nivîskar ev e ku bi hûrguliyên re mijûl nabe, bi bîr dixîne û şîroveyên paşperdeyî ji xwendeyan re dihêle. Herçiqas zimanê metnê sade û basît bixuye jî metneke kûr û giran e, xwendina paşperdeyan ne karê her xwînerî ye. Cih bi cih di redaksiyon û tewandinê de pirsgerêk hene. Li ciyek du ciyan bêhna tirkî bi ser mere dikeve. Di metnan de bi gewdekirina dehan tabloyên serbixwe û pevgerêdayî ne karekî hêsan e, lê nivîskar ji bin barekî giran bi serkeftî derketiye.

Du karakterên sereke yên romanê hene; Ferman û Gulfidan. Gulfidan keça cerdevanekî kuştî ye. Kesekî tarî ye û tarî dimîne. Ferman-Hurcahil kesekî xwezayî ye, saf e!

Gulfidan xwe û Ferman wiha pênase dike: “Kerengperek bûm, deviyên min hebûn, hişk bûm; ê ajalan nikariba havînan ez bixwarama. Havînan ba jî kêmbû. Rojek bablîsok li me rabû. Ez li bendê bûm ku parçe bibim. Baş e, min got, parçe bim jî ê tav li min de, ez ê bimînim li ser rûyê erdê! Lê bablîsokê ez birim, li darekê asê hiştim. Ji gewdeyê darê de daketim nav avê. Pêşî kêfa min hat; li ser avê li gorî dilê xwe bûm. Gayek hat ser avê, teşqele wisa ne, wî av vexwar, ez avêtim devê xwe.... Helbet kerengperek karibe ewqas biavêje kerengpera li ser avê diçe û tê. Her giya carna li ser koka xwe şîn nayê!”



Nivîskar şarezayî û nezaniya gundiyan a di xwedîkirina zarokan de bi du tabloyên cuda li pêş çavan radixîne. Tabloya yekem de zarok ji bo parçeyek naylona şîn a di nav gezgezokê de dema xwe xwar dike bi qêrîna dayika xwe re lawik sipî sar dibe di cihê xwe de... bilêvkirina navê mar jiyana zarok dîl digre. Di tabloya duyem de bav bi keçika xwe re dilîze... dibe kûçikê keçika xwe... Qasî pedagokekî serkeftî ye.

Di navenda metnê de gundiyeke li ber sekretê ye. Nivîskar di wê sahnê de şanoyeke trajîkomîk a kurt bi zimanekî zindî li dar dixê. Ev sahne li benda şanogeran e.

Di kesayeta Leylanê de em rastî trajediya evînên kuştî tînin. Leylan qurbaneke feodalîzmê ye. Gulsû û Nilgun du jinên qurban ên pergala Bavîksalariyê ne. Şengal û Kobanî kêmbê jî di nav metnê de cihê xwe digrin. Pratîzekerina xweseriya demokratîk dikeve ber gengeşî û lêpîrsînan...

Bi vê jêgirtinê dawî li nivîsa xwe tînim:

“Bajarê ku lê dijîm bajarekî bi barûd, hawar û gaziyan e.

Bajar li ser helkîn û hetiketiyên dem û emirberiya ‘aqilan e’.

Diyarbakir, Diyarbekira Rengîn, Amed, Warê Şêran... navên xwe hene...

Ew qas navên xwe hene xuya ye heya navekî bi dest bixê û dunya bi toz û dûman be...”

Hurcahil / Cîhan Roj / Weşanên J&J / Roman / 88 rûpel / Avrêl 2015

LABÎRENTA CINAN

Nivîskar bi serkarakterê xwe yê bi navê mamoste Kevanot re berê kamera-qelem ya xwe dide gundek ji gundên kurdistanê. Em bi vebêjiya nivîskêr û qisedana karakteran ve li gund û malên figuran digerin. Pirtûk mişt bi çîrokên ku nexweşînen derûnî yên ji tirs û nezaniye afirine dagirtiye.

Roman ji du beşan pêk tê. Beşa destpêk û dawiyê aîdî nivîskare. Beşa navîn jî karakter welew gundiyê bi navê Gebranê boço nûsiye. Bi destxeta Gebranê boço re em li 16 malên heman gundî dibin mêvan.

Zimanê metnê sade ye. Çîrok û vebijiyê her sê malên destpêkê a beşa navîn nûwaze ye. Ji ber ku di pirtûkê de kêmasiyên hizirin-fikirin a bi tirki, bê mantiqî û xwe ji birkirin serkêşiyê dikişîne wezê ji nîxandinek gîstî dûr bisekinim. Bi mînakên hîn kêmasiyên rûdane destnişan bikim dawî li nivîsa xwe bînim. Ji bo nivis dirêj nebe û ji hedê xwe derneyê wezê hevokên minakan kurt bikim.

HÎZÎRÎN-FÎKÎRÎN A BÎ TÎRKÎ:

Rûp=15: "Li ser zinarekî hember runiştî bû û hundurê xwe valayî bilûrê dikir..." (Karşidaki kayanın üstüne oturmuş içini kavalaya döküyordu...)

Rûp=61: "... min boyaxa porê reş bi kar dihanî." (...siyah saç boyasını kullanıyordum)


Rûp=146: "Hûn jî çûçikan berhev bikin..." (siz de kuşları toplayın...)

BÊ MANTÎQÎ:

Rûp=29: "... bi poz bêhneke dirêj dimije û dikişîne hundire xwe, çi bêhneke xweş!" Nizam mantiqa vê hevoksaziyê bi kijan zimaniye. Gelo însan bi derên xwe yên dî bêhnê didin û distînin.

Rûp=38: "...pirça laşê mamoste Kevanot lê pij dibe û devê wî ji hev dimîne, lê di vê gotara Koko de tiştê bala wî dikişîne..." Gotar: makale. Mamoste pirs ji xwendevan kiriye û xwende bersivê bilêv dike. Gelo nivîskêr li vir dixwaze çi bibêje?

Rûp=83: "...hemû şênîyên me jî rûmeteke pêwîst didine wî". Ka kirtikek mantiq bi vê hevokê ve heye gelo?



XWE JÎ BÎRKÎRÎN: Navên karekteran: Di rûpela 42 de navê karekter Sêvdînê Selîm dibe Selîmê Sêvdîn ango bav û kur cî diguherin. Di rûpela 150 de karekter lawê Cindî wek Salo binav dikin lê di rûpela 151 de Cindî ji lawê xwe re dibêja Sîno. Di esasê xwe de notirvan Mîxo ye lê çer çawa dibe nizam Siyabendê kor dibe notirvan. Em dizanin mekanê romanê bakûrê kurdistanê ye le nivîskar naxwaze navê mekan bilêv bike. Nivîskêr navê gund mekanê eslî bi tipa X binav kiriye lê di metnê de em rastî du cî waran tên; Cizîr û gundê Şîrterûtê. Serkarekter mamoste Kevanot li gund mamostetiyê dike û kurdek bajarî ye. Hîç ne li ser bala nivîskêre kurd bindestin û zimanê perwerdehiyê bi tirkîye. Mamoste Kevanot navên şagirtên xwe ji deftera dibistanê dixwine nav tev bi kurmanci ne li ser bala mamoste û nivîskare ku kurmanci qedexeye; Bodê, Xerzî, Koko, Zînê hwd. Nivîskêr bi bîra xwendeyên xwe dixwe ku gundi bi zimanê dibistanê nîznin û zimanê malê qise dikin û ew herdû zimên çî û çî ne ji bilî nivîskar kes nîzane. Le çî hikemete em di nava metnê de rasti du hevokên bi tirkî tên; Rûpel 109 û 143. Nîşe: Roman di 1994 de li Stockholmê çap bûye. Piştî şeş salên gilover di sala duhezarî de li stenbolê çapa duyem derçûye. Gelo berî çapa duyem hîç nehat bira nivîskêr û weşanxaneyê li berhemê di ber çavan re derbas bikin. Metna li ber dest li gor şert û mercên 1994 berhemek baş e. Lê em niha dibînin ku pirtûk li ber çerxa zemên hêrifiye.

Labîrenta cinan

Hesenê Metê

weşanên avesta

99 NEH MORÎKÊN BELAVBÛYÎ

99 Morîkên Belavbûyî navê romana Helîm Yûsiv a dawî ye. Weke romannûs di destpêka romanê de diyar kiriye ku ev roman ji rojnivîska werger/karakterê ku nivîskêr ew bi navê Azad pêname kiriye bi gewde bûye. Bi gotinek dî, ev romanek rasteqîn e; bi tevî ku nivîskêr guherîn di rojnivîskê de pêkanî ye.

Piştî çend romanên ku min di van rojan de bi darê zorê xwendibûn û yek jî min nîvco hişt, min "99 Morîkên Belavabûyî" a Helîm Yûsiv di du bîhnan de, ango di nav 24 saetan de xwend.

Bawer im hewce nake behsa çîroknûsî û romanûsiya Helîm Yûsiv û çêja zimanê wî bikim. Lê piştî min ev roman qedand, serê xwe kir nava destên xwe û dest bi pirsîna pirsan kir, girêk di qirika min de rûnişt. Lewre wek xwînêrekî kurmancî hêviya min ji qelema nivîskêr hebû/heye. Lê vê romanê hêviyên min basko kirin.

Berî ji kêmasiyên ku rû dane çend heban destnîşan bikim, divê vê pirsê ji weşanxanê û edîtor bikim. Gelo kêmasiyên ku telafiya wan berî çapê mumkûn bûn, we çima bi nivîskar nedan serrastkirin?


Roman, bi pînekirina dehan çîrokên ku Azad di dema wergêriya xwe de bûye şahidê wan 150 rûpel dagirtiye. (Ne ku çîrok bêqîmet û bê taqet in; berevajî birînên şerr yê di gewdeyê takekes û cîvakan de vekirine/dikin tût û rût li ber çavan radixînin.)Lê çîrokên bi heman terhî me di pirtûka nivîskêr a bi navê "Auslander beg" de ji xwe xwendibûn.

Bi gotina nivîskêr karakterê bi navê Azad di sala 2002'an de hatiye kuştin. Ji ber ku nivîskêr bi berpirsîyarî rabûye ewqas konsantreyî mexseda ("serşûştina" rojnivîsk û tizbiyê) xwe bûye xwejbîrkerin bûye bela serê nivîskêr.

Nivîskar, bûyerên îro li Sûriyeyê rû didin, bi karakterê ku di sala 2002an de miriye dide vegotin, him jî ne carek, ne dudu, ne sê caran... Ka em du mînanan ji romanê werbigrin.

XWEJIBÎRKIRIN:1

Rûpel: 121= "Mêrê Canê bûbû fermanarekî hêzên çekdarên kurd, ku li hemû herêmên kurdan hatibûn avakirin. Canê jî çek hilgirtibû û di nava jinên çekdar de cîh girtibû"



Rûpel: 126= "Di van demên dawiyê de şerr, bombebaran, serjêkirin, bûyerên xwînî zêde bûn û Sûriye bû kulmozek rihdirêjên tundrew û cîhadiyên ku serjêkirina mirovan û vexwarina avê li cem wan wek hev bû."

XWEJIBÎRKIRIN:2

Rûpel:116= "Her dengêk, her xuşexuşek, her livek yan lebatek dihat, destê min diçû ser kêra ku her gav bi min re bû." Ka em binêrin di rûpela bê de çi diqewime.

Rûpel:118= "... ez destvala nehatim. Min kêrek kirî, bi taybetî ji bo xweparastina li dijî êrîşên muhtemel...." Gelo şîrove hewce dike?

XWEJIBÎRKIRIN:3

Rûpel:62= "Aliyek, mêrekî şikestî û xemgîn ku bi giyanê diya xwe ya mirî re dijî. Evîndarê girî, xwediyê dilê tenik, mîna hirçekî ku di nav berfa tenêtiyê de bigevize, porspîbûyî û kal." Ka em binêrin porsipî û kalê me çawa dibe porreş.

Rûpel:63= "Ez biyaniyê ku ji dawiya dinyayê hatiye, yek ji sedan porreşên ku li ser kursiyên fêrbûnê û li ber mamosteya zimên rûniştîye, bûye evîndarê mamosteya xwe." Karekter gihîşt porreş xwe yê reş û bila îspatkirina ciwaniya karakterê jî bimîne ji xwînêrên din re.

Tizbiya 99 morîkên reş di xwe de dihebîne diyariya hezkirîya Azad a bi navê Bêrîvanê ye. Dema Bêrîvan tizbiyê wek diyarî pêşkeşî Azadê nû simbêl xwîdaye dike, Azad sozê dide xwe û Bêrîvanê wê heta roja mirinê ji destê xwe yê çepê dernexîne. Piştî demek kin li ser îddia/komplo ya Yasîno, Azad bi çavê serê xwe dibe şahidê pevşabûna Bêrîvan û Yasîn. Azad wek sed kêr lê bikeve bi nûze nûz xwe diavêje mala xwe û hemû wêneyên ku ji sûretên Bêrîvanê pêkhatî di yek derbekê de dişewitîne. Lê derxistin û qetandina tizbiya reşî sê çekû* hîç nayê bîra karakter. Piştî bûyerê karakter berê xwe dide zaningehê. Pişt re dikeve zindanê, di bin êşkenceyê re derbas dibe û karakter bi şert serbest tê berdan. Wexta karakter nîv azad dibe, berê xwe dide Almanayê, dibe penaber. Salekê bêhtir di kampa penaberan de dijî, piştî mafê rûniştinê tê dayîn, qasî salekê qursa zimanê Almanî dibîne û di wê navberê de dilê karakter/Azad dikeve mamosteya wî a bi navê Sandra. Bi herikîna demê re Azad û Sandra ya "dixerab"/dexes dizewicin. Sandra bi tu awayî bawer nake ku mêr bi jina xwe re sadiq dimînin. Teqîben piştî sal û nivek ji ber "dil xerab"/dexesiya Sandrayê hev û din berdidin. Heta roja keça wan çavê xwe li dinê vedike jî, tizbiya ku mora xwe li romanê xistiye, ne di bîra nivîskêr û ne jî di bîra karakteran de ye. Sandraya ji ber hesûdiyê mêşê dike gamêş, lê çi hikmet e, tizbiya her wext di destê mêrê xwe de ferq nake, lê berdesta nexweşxanê di deqeya ewil de ferq dike. Halbûkî tizbî ji bo bahaneya hevberdanê amûrek zêrîn e, lê nivîskar bi salan e ku ji wê emaneta "pîroz" bêhay e.

Gotina dawî xwezî kêmasiyên li jor rûdane pêşgarî metnê nebana û min jî bikariya bi çavekî dî li romanê binihêriya. Bikaribûma biketama dû raza sembolên di wêneyên şewekariyê de. Hûr û kûr li ser derûniya paşperdeyî a karakteran bisekinyama. Lê mixabin dema di metnê de kêmasiyên "maddî" zêde rû didin nikarim wan nebînim û berê xwe bidim hêlên din.

99 Morîkên belabûyî

Helîm Yûsiv

Weşanxane: Peywend

Nîşe: Sê çekû; tizbiya ji 99 morîkan pêktê.

04.12.2015 facebook

TESADUF-RASTHATINÎ "MARÎA MELEKEK BÛ"

(Maria Melekek bû: Firat Cewerî & Zahir: Paulo Coelho)

Kuliyên berfê bi bê re dirreqîsîn li kûçe û kolanên Stenbolê. Pile pila tv yan bû. Agahî li ser agahiyê belav dikirin: Wê berfek ezamet bibare û çend rojan heyatê li Stenboliyan bike jehr. Min berê xwe da pirtûkxaneyê dewletê. Şans kompîtorên pirtûkxaneyê têk çûbûn.

Min ê di nava bi hezaran pirtûkan de ji xwe re pirtûk hilbijarta. Piştî lêgerinek dûdirêj min du pirtûkên rexneyê hilbijartin û çavê xwe ji bo romanekê li refên pirtûkan gerand. Navê Paulo Coelho bi heft dilan ez vexwendim cem xwe. Di nava pirtûkên Coelho de min romana wî a bi navê "Zahir" hilbijart û piştî qeyidkirina pirtûkan ling kir qurban û berî da mal. Bi xwendina romanê re hestek ecêb ez girtim nava pêlên xwe wek ku min berê ev pirtûk xwendibe. Û min li facebookê ev nîşe belav kir:

"Niha pirtûka Paulo Celho a bi navê 'Zahir' dixwînim. Ger min hiş neçelqandibe ne bawerim berî niha min ev pirtûk xwendibe. Hevok, dîmen û sahne bi min xerîb nayên û dikim nakim nayê bîra min ku min li ku xwendine..."



Bi rasthatina navê Maria re cinên min li defa hewarê a bîranînan dan. Min berî da nava pirtûkên xwe û "Maria Melekek bû" li ber xwe raxist (du sal berê min ev roman xwendibû). Bi çavgerînek sivik re xumamî û tariya di hişê min de ronî bû. Min xwendina romanê domand û her nîşe wergirt. Piştî romana bi navê Zahir qediya 7 xalên hevbeş yên herdu romanên ku behsa wan dikim derketin holê. Pirtûka Paulo Coelho "Zahir" di 2005an de derçûye. "Maria Melekek bû" di 2013an de. Mijarên romanê cuda ne; lê 7 xal qey tu dibê felqeyên heman sêvê ne. Tiştê ku ez ê niha bi we re parvebikim ne hevrûkirina herdu pirtûkane û ne ji îspatkirin û îdîa ye, ku Firat Cewerî romana xwe ji hin qewimînên di romana Paulo de rû didin daraştîye.

Gelo hevbeşiya van heft xalan birra tesaduf e? Gelo ev her heft xal ji nava romanê werin rakirin wê tu hal di romanê de bimîne? Ne bawer im.

Li vir pirs xwe didin der: Gelo Firat Cewerî romana xwe li ber romana Paulo Coelho nivîsî ye? Heke ne wiha be, gelo mumkûn e ku evqas xalên du romanê bişibin hev?

Kerem kin!

PAULO COELHO: ZAHİR

1. Nivîskar ji ber wendabûyina jina xwe ketiye ber lêpîrsîna polêsan. 2. Navê qereqterek jin Marie ye. 3. Qereqtera bi navê Marie, heval, dostik welew metresa nivîskêr e. 4. Qereqter romannûs e. 5. Xaça Îsa: Qereqter xaça Îsa wek alavekî êşkenceyê bi nav dike û rexne li civakê digre; ji ber ku wek qolye û wenê û hwd tê bikaranîn. 6. Nivîskar (qereqter) ji bo bikaribe pirtûka xwe binivîsîne bi zora jina xwe malê diterikîne û piştî geryanek dûvedirêj li Spanyolê dest bi nûsîna romana xwe dike. 7. Nivîskar (qereqter) her li dû şopa jina xwe ye û xwîner li dû xwe dikişkişîne.

2. FIRAT CEWERÎ MARÎA MELEKEK BÛ

1. Qereqtera bi navê Marîa tê kuştin, nivîskar dikeve ber lêpîrsînê. 2. Navê qereqtera sereke Maria ye. 3. Qereqtera bi navê Marîa penaber e. Nivîskar tercûmaniya wê kiriye; bi bihurîna demê re "dostanî"yek di navbera wan de çêdibe. 4. Nivîskar (qereqter) romanûs e, di pirtûka xwe de. 5. Xaça Îsa: Xaçek zêrrîn e li ser sînga Marîa'yê; wexta çavên nivîskêr li xaça zêrrîn dialiqin Marîa sînga xwe ya tazî dinixumîne û xaça Îsa dikeve nava memikên wê. 6. Nivîskar (qereqter) ji bo romana xwe binivîsîne mala xwe dîterikîne û li havîngehekê dest bi nûsîna romana xwe dike. 7. Nivîskar xwendevanan her li dû şopa kuştin û veşartina termê Maria yê digêrîne.

Nîşe: Ev nivîs di kovara bi navê "Heterotopîa" hejmara sêyemin de derketiye. 2016

MÎRNAME

Di vê nivîsa xwe de ez ê hewil bidim, romana nivîskar Jan Dost a bi navê “Mîrname” binirxînim. Zimanê romanê ji xeynî hîn hevok û peyvane sade û helbestî ye. Dema merû li dîmena giştî a romanê dinêre mere dibîne ku nivîskêr berî dest bi nivîsîna romanê bike gelek lêkola ye û kedek xweş daye. Di beşa destpêkê de vebêj nivîskar e; pişt re, beş bi beş kesayet welew qereker romanê vedibêjin.


Hema bêje zimanê nivîskêr û qerekeran yek e; Ji ber ku nivîskar wek çavdêrekî li derve nemaye, qereker di bin baskê helbestvaniya nivîskêr de eciqî ne. Romannûs, ji dîmena giştî bêhtir ketiye tatêla barîna hibrê (bi baranê re) û vemirîna çira’yan; ji ber wê yekê her xwe ji bîr kiriye û noqî derya nakokiyan bûye. Di metnan de hevgirtina giştî-mantiqî ji bo min bi qasî tevî, şêwaz û herikîna girînge. Ka em bi hişekî hişyar bikevin dû nakokî, kêmasiyên rûdane.

Rûpel: 15= “Bilezînin da ku termê seyda şil nebe.” (piştî çar hevokan)

“Heyran ev demeke em di bin baranê de dimeşin û kefenê Seyda hêj ziwa ye!” Mele Ferîd ê ku doza lezandinê kiribû, keserek dirêj ku bi kefenê reş yê poşmaniyê hatibû pêçandin, hilanî û got: “Seyda agirek dadayî bû dê çawa kefenê wî şil bibe!” 1. Mele Ferîd, çima poşman e? Nivîskêr ev eşkere nekiriye. 2. Peyva “Seyda agirek dadayî bû dê çawa kefenê wî şil bibe!” gotineke idealîzekirî ye û ev nepixandina xwestinên romannûs bixwe ye. Çimkî herçiqas Seyda di saxtiya xwe de agirek vêxistibe jî, niha mirî ye û termê wî yê wek hertiştê li ber baranê şil bibe. Çimkî termê şahînsahan jî şil dibe û ê parsekan jî.

Rûpel:17= “Gelî cemaet biborin, ez taze bi karwanê ku ji Urmîyê tê re gihîştim, min hinek şalên nû ji wir anîne. Dema ez daketim min nizanibû çî mesele ye, ji ber ku kesekî bar dayne li bajêr nemabû, min berê xwe da vir. Rast e ew çî hawar bû ji mala mele Qasim rehetî kete guhê min!” Mele Qasim birayê Ehmedê xanê yê mezin e. Hecî Zuhdî yê bazirgan serê xwe bi diravan re xwariye hatiye nav mezelan, pirsên ecêb dike.

Rûpel:18= “Mîrza Sebrî û mirovê rûnuxamtî ew girtin û xistin wê çalika ku di diwarê quble yê gorê de bi qasî du bostan hatibû kolandin. Pişt re rêzeke ji keviran li dirêjiya term danîn û êdî Xanî bi kefenê xwe yê ziwa û hesretên xwe yê vêketî ji ber çavan wenda bû. (piştî 20 rêzikan) Û



bû xiştexiştâ bêran û axa şil bi ser termê Xanî yê ku bi kefenekî spî û ziwa pêçayî anîne xwarê.”
Ma ne dema kevir li dirêjîya termê Xanî danîn termê Xanî wenda bûbû?

Rûpel:21= “Baran êdî hûr hûr û aram dibariya. Pir bi nazikî dibariya, weke ku ezman fatîheyê li ser ruhê seyda dixwîne, barana xunavî bi nermî û xemgîn dibariya.” Ma ne barana dixundive xemgîne hêdî, nerm û aram dibare? Îja ev çendbare bûn çî ne?

Rûpel:35= “Hemamên wê, sûka wê, çiyayê Nemrûd, çem û baxên wê, camî û medreseyên wê û kela wê ya bilind û asê dihatin ber çavê min û min xwe wenda fikir û nema zanibû çend rikat nimêj kirine.” Haya xeznedar, dengbêj û hefizquran Emerê kor, ji bayê felekê nine, ku meriv bi nav xeyalan ket nimêj qebûl nabe. Nivîskar behsa Bilîsê dike. Çiyayê Nemrûd ê bi nav û deng ne li Bilîsê lê li Semsûrê ye. Di navbera Tetwan, Norşîn û Exlatê de golek û girek bi navê Nemrûd hey e. Nivîskar ev gol û gir bi nav nekiriye, raste rast dibêje Nemrûd û ew jî dibe sedem ku serê xwînêr tevlihev bibe.

Rûpel:40= “Ji bîna kitêbê, ji çermê wê yê nerm û sehifeyên wê yên hîn bîna qûmê û hibrê ji wan dihat, min zanibû ku ew nû nesix bûye. Min pişikên xwe ji hilma wê ya xweş dagirtin û got: - Bîna du dilên şewitî jê tîn!” Emerê xeznedar, dengbêj û hefizquranê kor, Dema Xanî Mem û Zîn nivîsî ye ne li Bazîdê ye. 5 Salan ji Xanî û Bazîdê dûr e û haya wî ji çêkirina cûreyê murekeba Xanî û nivîsîna Mem û Zîn nîne. Em koriya Emer bidin aliyekî, ma gelo pozê ku aşînayê bîhna tiştêkî nîn be, çawa dikare binase?

Rûpel:47—48= “Wî bi devê xwe yê kefgirtî pif kire şemala li ber serê min û lingê min ji hev vekirin û ber bi jor de hildan, li ser milê xwe danîn û derbasî min bû. Ez ji qîzanî xistim (piştî du rêzikan). Wê kişmekişê dirêj nekir û min dît ortiniyek (nabihîze, lê dibîne) pê ket û bi lez ji ser zikê min rabû.” Ma Şengê bebikeke pilastîk e, ku çîpên wê li ser milên mêrê wê ditevin û mêrik ji ser zikê we radibe? Lewra nivîskêr ji bîr kiriye ku wexta mêrekê herdu nigên jinekê danîn ser milên xwe, nikare li ser zikê wê suwar bibe.

Rûpel:54= “Ehmed efendî keça min Şengê dixwest. Lê min nedayê.” Her çiqas Zuhdiyê bavê şengê bi devê Emerê kor behsa xwestina keça xwe bike jî, em bi tu awayî ne di vebêjîya Şengê de (hezkiya Ehmedê Xanê ye) ne jî di ya hevalên wî de nabînin, ku Xanî Şengê ji xwe re xwestiye; lê Zudiyê bazirgan (bavê şengê) dibêje min Şengê nedayê. Tenê kesê ji Xanî hez nakin behsa xwestina Şengê û nedayînê dikin; ev jî feqeke bi nakokî ye û li gor min romannûs bêyî lê hayî bibe pê li vê feqa kiriye.

Rûpel:100= “Ew çend carî hatibû dikana min û cilên zarokên xwediyê xwe li ba min didirûtin. (piştî 19 rêzikan) Xwedêkirî xwediyê dikanê ji bo rêwitiyek dirêj ji Stenbolê çûbû Edîrne yê...” Xwediyê dikanê gihîşt dikana xwe û terziyê me dîsa bû karker. Gelo terzî cilan didirû an keçika boşnaq? Ma ne diviya bigota li ba min dida dûritin.

Rûpel:102= “Min li çep û rastê xwe nihêrî, ji reşayê pê ve tu kes li caddeyê nebû. Êdî Stenbolê ebuyê xwe yê reş werdigirte xwe û tarî hêdî hêdî dikete erdê.” Ger ji reşayê ango tariyê pê ve tiştek li der tunebe gelo careke din Stenbol çawa ebuyê xwe yê reş werdigire ser xwe?

EHMEDÊ XANÎ Û DILKETIYA WÎ:

Rûpel:160= “Te digot me termê zarokêkî şeş salî hilgirtiye ne yê kalemêrekî şeşt salî.

Rûpel:55= “Mele Ehmed efendî tu mirovekî êdî nîvê riya te spî bûne, dev ji van şîrên xwe berde û namûsa xelqê erzan neke.” Vebêj Zudiyê Bavê Şengê ye; Şengê jî dilketiya Ehmedê xanê ye. Zudiyê bazirgan bi sergirtî ji Xanî re dibêje nîvê rûyê te sipî bûye, tu kal î, dev ji keça min berde. Ka em binêrin Xanî dema dilketîbûnê de çend saliye?

Rûpel=156: “Wî qet ji tu kesî re behsa wê evîna xwe ya berî sî çil salî nedikir.” Ehmedê xanê dema wefat dibe 60 salî ye. Zuhdî efendî jî hê keça xwe nedaye mêr; ji Ehmedê Xanî re dibêje: “Nîvê rûyê tespî bûye.” Em ji 60 salî çilî derînin wê bimîne 20. Dêmeg rûyê Xanî di bîst salî de sipî bûye. Nivîskar bi tu awayî behsa sipîbûna rûyê Xanî yê ciwan nake. Rûpel:49= “Ez hivde salî bûm. Bavê min taze ji hecê hatibû û giregir û mezinên Bazîdê hemî dawetî malê kiribûn. Ê min ji wê qerebelixê bala min li ser delaliyê dilê min Ehmedê Xanî bû.” Li gor hesabê jor, Xanî û Şengê hevsal in. De were ji nava van nakokiyên ku serê romannûs xwarine, derkeve!

Mirina Ehmedê Xanî:

Rûpel:171= “Ma ku ne çê bûya di roja îne de dimir. Ji xwe ew spartin roja yekê remezanê jî û ew tê de definandin.”

Rûpel: 185= “Wê sibeha han.... (piştî 14 rêzikan) –Cemaeta misilmanan! Şêx Ehmedê Xanî çûye rehetê. Dê cenazeyê wî bibin mizgefta jor. (piştî 18 rêzikan) Roja şemiyê bû, roja ewil ji rojiya misilmanan bû.” Gelo şîrove hewce dibe?

Encam: Ji bo nivîs dirêj nebe û ji heddê xwe dernekeve dawî li minakan tînim. Pirtûk hê gelek nakokiyên bi wî hawî di dilê xwe yê helbestî de dihebîne. Xwezî nivîskêr berî çapê careke din bi baldarî pirtûka xwe bixwenda, da ku me jî te’amek ji vê romanê werbigirta.

Mîrname

Jan Dost

Weşanên avesta-2008

ÇÎROKEKE GEWRE XADIM

Xadim: Navê pirtûka çîroknivîskarê kurd Selahattîn Bulut e. Pirtûk “çîrokeke dirêj” di dilê xwe de dihebîne. Em bi haziriya pêşwazîkirina kurê Xelîl beg, yê bi navê Jêhat (ê ku ev deh sal in di zindanê de ye û wê ji zindanê derbikeve) re di şemûka pirtûkê re dikevin hundir û bi windabûna Jêhat a di nav kûçe û kolanên teng re derdikevin der.

Zimanê nivîskêr sade û cih bi cih bi motîfên Mêrdînê neqîşîye. Nivîskêr xwe ji zîmanê çêkirî gelek dûr xistiye û dewlemendiya zimanê kurdî li ber çavan radixîne. Zimanê berhemê gelek nerm e, ev jî çêja berhemê xweştir dike. Jêhat, xortekî ji malbata me ye. Lê mixabin jiyane ew qas serî li me badaye, haya me ji me nîn e. Jêhat di zindanê de her cure îşkence dîtiye û di serencamê de tîmsaliya mêraniyê serê xwe çemandiye. Nivîskar vê mijara dramatik digire dest, bêyî ku zêde bikeve dû diramatîzekirinê. Qey tu divê nivîskar bi xwe ew êşa malkambax jiyaye û ji xwe bawer derûniya Jêhat vedikole.


Xadim, neynikê digire rûyê civak û siyasetê, bê ku xwîn bike, gulebaran dike.

Xadim, çîrokek siyasî ye. Zimanê beloq yê siyasî û sloganîk di xwe de nahebîne, deriyê xwe ji zimanê tisî re kîp girtiye.

Du reng in, reş û spî. Dikutin hev, di hev de dimirin; gewr diwelide. Gewr, bi serencama xwe dizane. Gewr henûn e, bi keder e, bi xwe zane, xiyanetê li xwe nake. Gewr, hem yeke hem sisê ye. Hem dê ye, hem bav e, hem bi tena serê xwe ye. Ji ber wê dibêjim Xadim çîrokeke gewr e.

Xadim; çîroka ji duriyana ‘novel’ê li xwe vegeryayî ye.

Xadim; belgeyek ji dîroka me ya reş e, maye ji zarokên me re.



KEVOKA SPÎ Û ROMANSEK ÇILMISÎ

Pirtûka yekem: Kevoka spî

Kevoka spî ya Firat Cewerî ji heşt çîrokan pêk tê. Ez dê hewil bidim di derheqê çend çîrokan de hest û ramanên xwe bi we re par ve bikim. Zimanê nivîskêr sade û herikbar e. Ez bawer im her kurmancê ku li gundan jiyabe wê bi hêsanî jê fêm bike bêyî ku serî li tu ferhengan bide.


Kevoka spî:

Mijara çîrokê derûniya xortê ku li ser navê “namûs”ê xweha xwe di kuje ye. Balkêş e. Wek kêmasî, nivîskêr ji dêvla Enqereyê, Ankara bi kar aniye.

“Gulleya pêşî ku berdabûyê mêjiyê wê ji hev belav kiribû û ji ber ku bera eynî cihî dabû, lê keçik bi gulleya pêşî re çokên wê fisiyabûn û hêdî herikîbû erdê, her heft gulleyên ku berdabûnê li eynî cihî ketibûn.” (rûp. 17, rêzik 7). Nivîksar dibêje mêjiyê keçikê bi gulleya pêşî re ji hev belav bûye; paşê, wek xwe biderewîne, dibêje ji ber ku berdabû eynî cihî. Bi wê jî nasekine, paşê carek din dubare dike, her herft gulle bera eynî cihî dabûn. Xuya ye ku nivîskêr di vê hevoka dirêj de meqseda xwe ji bîr kiriye. Bi gulleya ewil re mêjiyê keçikê belav bûbe, îca çawa her şeş gulleyên din li heman cihî ketin? Nakokiyeka din jî ev e. Em ji çîrokê fêm dikin ku birayê keçikê xwendevanê zanîngêhê ye û hîç çek bi kar neaniye. Gelo kesê çek bi kar neanîbe kare wek sekmanekî heft gulleyan li yek niqteyê xîne?

Doktor Sertac:

Wek ji navî jî diyar e, mijara çîrokê Doktor Sertac e. Doktor Sertac kesek ji malbata Şêx Seîd e. Doktor ji ber qelewbûna xwe du caran emeliyat bûye û hê jî nikare kincên bi dilê xwe li tu konfeksiyonan bibîne. Doktor Sertacî dil berdaye mamoste Perwîn ya kurdperwer. Ji ber ku Perwîn guh nadeyê, ew wek cewrik bi dû qûna Perwînê de dike nûzenûz. Doktor Sertac araqvexwar e. Li ser maseya wî ya xebatê (ya li malê), wêneyê Atatürkî çikilandiye. Komarparêz e, kemalîst e. Doktor kesekî wilo ye ku dilê mirovî jê dixele. Bi kurtî, çîrok ev e. Ji bilî çîrokê, mirov dikare her navî li vê “çîrokê” bike. Nivîskêr çîrok kiriye qûrbana kîn û xezeba xwe. Çîrok ji xwe re kiriye bahane û ketiye dû reşkirina malbata Şêx Seîd. Nivîskêr hew carekê navê Şêx Seîd bi kar aniye, ew jî ji bo lehengê xwe bi me bide nasîn ku ji malbata Şêx Seîd e. Çima ne kesekî din, lê Şêx Seîd? Gelo sedemê nivîsandina vê çîroka magazinî çî ye? Reşkirina malbata Şêx Seîd e yan danasîna ferdekî ji wê malê ye? Gelo nivîskar dixwaze ji me re bibêje ka binêrin neviyên rêberên kurd di çî halî de ne? Lê em hîç rastî emareyên bi vî rengî nayên. Gelo sedem oldariya malbatê



ye? Û bi dehan pirsên din. Di çîrokeke wilo de, bikaranîna navê Şêx Seîd, me bi milama nivîskêr dihesîne ku bixwe qet ji ola îslamê hez nake. Gelo ez ji ku gihîştîm vê qin'etê ku nivîskar dijberê ola îslamê ye. Dema mirov vê çîrokê û çîroka "Li berberxanê" ya di pirtûka wî Romansek çilmisî de dixwîne, qin'eta mirovî dikeve cih.


Pirtûka duyem: Romansek çilmisî

Wek ji nav jî diyar e, Romansek çilmisî çîrokeke romantîk e. Lehengê me çendekî di mal de dimîne tengezar dibe û ji mal derdikeve. Li qafeteryayeke havînî rûdine; bi tesadufî ew û keçîkek hevdu dinasin; roj û şevê romantîk û bişewhet bi hev re derbas dikin. Paşê, destê sibê keçîk nameyekê li dû xwe dihêle, dibêje: "Min pir ji te hez kir, lê ez naxwazim bi kesekî ve werim girêdan û va ye min tovê te hilgirtiye nava xwe, ez ê zaroka me bînim dinyayê". Piştî xwendina vê çîrokê, mirov dibêje, ey çî? Gelo wexta nivîskarê vê çîrokê wê dixwîne, misqala coş û te'ama edebî jê werdigire? Ne bawer im.

Li berberxanê:

Vebêj tevî xanima xwe ji Norveçê berê xwe didin Enqereyê mala xezûranê xwe. Vebêj ji bo porê xwe yî dirêj biquşîne, berê xwe dide berberxaneyê. Bi silav dayinê re berberê rihdirêj bi sertî vebêjî keremî ser kursiyê dike. Vebêj çavên xwe di awênayê re li hundir digêrîne. Li dîwarê hember, çavên wî – bi qewlê nivîskêr – "li paçîkekî kesk î bi tîpên erebî xemilandiye" dikeve. Piştî diyalogeka kurt, berber porê wî dike nava destê xwe û jê dipirse: "Ma tu ji xwedê natirsî porê xwe wiha dirêj dikî." Welhasil, berber dest pê dike por ji kokê de diqusîne. Vebêj dengê xwe nake. Vebêj di şûna xwe de ji tirsan melisiye. Paşê berber bi kêfa dilê xwe rû û cênîkên wî kur dike. Êdî vebêj jî ji hêrsan xwe nagire, radibe çêran dike. Berber jî gwîzên diavê qirika wî. Bi wê birîndariya xwe radibe û wek dînan bi nava cadeyên Enqereyê dikeve. Bi kurt û kurmancî, çîrok ev e. Ji ber ku nivîskêr derê çîrokê kîp nekiriye, ango derî vekiriye, em nizanin aqûbet çawa dibe; bê ka ev xewn yan xeyal e. Lê bi vî halî jî, çend pirs tûşî hişê merûyan dibe. Ma gelo sofî û dîndar ew qas weş in, bê ku pirs bikin serê mirovî kur dikin? Ji ber ku berber rihdirêj e û li ser pîneyê kesk nivîsa erebî heye, nivîskar wî wek hov dide nasîn. Gelo armanca nivîskêr eşkerekirina fanatîzma sofîkên olî ye? Bes ji ber ku taqeta bibîrxistinê bi vê çîrokê re tune ye, wek xwendevanekî, mirov nikare tişteki din bêje. Li cihekî wek navenda Enqereyê, qewmîneke bi vî rengî hinekî zehmet e. Piştî xwendina vê çîrokê, mirov pirsekê ji xwe dike: Gelo pîneyê kesk û Qur'an nîşana fanatîzmê ye?

Fala nûrikê:



Çîroka herî balkêş û hêjayî xwendinê ye. Karaktera bi navê Gulê, di ciwaniya xwe de, li cem Nûrikê li fala xwe mêze dike û Nûrikê çî dibêje hemû rast derdikeve. Ew fal dibe mar û xwe li Gulê radipêçe, jiyana wê dike jehr.

Girtiyê şeva reş:


Şevê şervan li derê doxtorê kurd dixin û doxtor ji neçarî şervanê birîndar di mala xwe de derman dike. Paşê ew şervan dikeve destê dewletê û li xwe mikur tê. Doxtor tê girtin û êşkenceya nemayî lê tê kirin. Ji ber ku vebêj xîtabî doxtor dike, cînavkên kesane xwerû û tewandî, tu û te, bi kar tîne. Dema mirov noqî nava 24 rûpel û nîvan dibe, her serê gavekê pergî tu-te yan dibe. Ji radeyekê şûn de, tu û te wek dilopên êşkenceya Çînê di serê mîrovî de dikin çingînî; nahêlin merû bi vebêj re bikeve nava deryaya rûpelan û ajne bike. Wan tu û te yan gelek bala min kişand. Piştî çîrok xelas bû, min qelesa xwe girt destê xwe û tu û te jimartin. Di nava 24 rûpel û nîvan de, nivîskêr 525 caran tu û te bi kar aniyê.

Encam: Wek em dizanin nivîskêr êdî çîrok li dû xwe hiştine û romanên dinivîsîne. Ev ji çîrokên wî yê kevin in, lê nû ketine destê min. Diyar e ku nivîskar jêhatî û jîr e; lê pir bi xwe bawer e, loma jî zêde li ser çîrokan nesekiniye û nehunandine; bi awayekî xav daye navê.

Nîşe: Ji ber ku di çîrokên “Stêrkek ji ezmanê me xuricî”, “Çîrokjiyana min” û “Baqek gulên sor” de mesajên nazik (siyasî) hene û ji bo rê li pêşiya polemîkên nû veneke, qet behsa wan nakim.

NÎŞEYÊN DERHEQÊ GERÎNEKA GUERNÎKAYÊ DE

1. Sehne û motîfên metnê wekî tevna pîrikê li hev hatiye balandin.
2. Nivîskêr kamera daye ser milê xwe û bi vegotina Lîsa/Abîdeyê re, me li “duh, îro û pêr” digerîne.
3. Roman bi teknîka xwe ve hiş û takekesek kaotîk li dar dixwe. Xwendevan nema dikare ji nav zemên derkeve.
4. Roman ji salên heştê de dest pê dibe.
5. Karaktera di zarokatiya xwe de rastî tacîzê hatiye qutufiyê nava xwe. Bi çîrokên diya xwe re vedikişê nav atmosfereke mîstîk.
6. Periya dirêj karekterek herî balkêş e. Xwezî çîroka wê wekî xeml nema ba di nav metnê de.
7. Dayika Şaxê temsiliyeta jina kurd a xwedî hafizeya çanda devkî dibe.
8. Bav siyasetmedar e (rewşa bav xumam e, xwezî hinek din zelal bibûya) piştî tê girtin malbat wekî erebeyek lastîka wê teqyaye ji kaş ve berev têkçûnê diçe.
9. Metin serê xwe bi bandora şer a li ser derûniya takekes re diêşîne. Derûniya takekes û civakê li ber çavan radixine.
10. Metin bi tevî sêwêrîna berhemeke otobiyografîk xuya dibe.
11. Berhem ji hela sahne û dîmenan ve zengîn e gelek çîrokan di nav xwe de dihebîne.
12. Metin di heman demê de metnek siyasî ye. Şahidiyê li gelek qewiminan dibe. Wextê em metnê dixwînin, kifş dibe ku nivîskar bi xwe jî yek ji wan şahidên qewiminên di romanê de ye.
13. Nivîskar di fînalê de bi lîskek biçûk pêşî li gelek pirsên divê bihatana kirin digire. Tevliheviya heyî kaoîktir dibe.



14. Piştî bav ji zindanê vedigere mal karekter bûyerên rûdane ji bo bav vedibêje. Her çiqas karekter rastî û xeyalan tevlihev bike jî vegotin zêde zêde edebî ye, li bejna romanê nayê.

15. Cih bi cih lukumîn hebe jî mirov dikare bibêje niviskar neketiye xefika berpirsiyariyê lewma jî cila xwe ji avê derxistiye.

16. Edîtor bi tevî serê xwe bi romanê re gelek êşandiye, kedek xweş dabe jî, di ser hin bêmantiqiyên madî re gav avêtiye. Her wiha cih bi cih redaksiyon jî bi problem e.

Gotina dawî; Ev berhem û berhemên berî vê romanê, yên bi heman terhî derçûne, ji me re dibêjin, kurd bi tevî bindestiya xwe a sedsalane xwedî aqilek rewşen in, di nava şerê germ de jî dikarin kûr û dûr li meseleyan/birînan binêrin/tehlîl bikin. Bi gotinek dîtir, dikarin derziya di çavê xwe û şûjina xelkê de bibînin.

Nîşe: Wisa diyar e wê romanên li ser derûniya takekesan û civakê disekinin mora xwe li edebiyata kurmançî bixin di rojên bê de...

DEWRÊŞÊ EVDÎ & KULÎLKA BILBIZÊK Û RÎM

Romana Eyup Kiran a bi navê “Dewrêşê Evdî & Kulîlka Bilbizêk û Rîm” bi zimanekî sade, ku bi gotinên pêşyan xemilî, giran giran diherike. Nivîskêr, ji bo hîn peyvên kêmtên zanîn ferhengek biçûk di rûpelên dawî de bi cih kiriye – ev yek jî barê xwendevanan sivik dike. Vebêjê vê romanê, welew destanê nivîskar e.

Nivîskar dest nedaye movikên esasî yên destanê. Wek em ji pêşgotina dûv û dirêj fêhmê dikin, ku nivîskêr kedek xweş daye pirtûka xwe. Nivîskar, bê ku zêde bikeve dû wê eşqa trajîk û dramayekê li dar bixe, berê xwe daye rewşa welêt a wê demê. Çanda koçerî, siyasî û erdnigari xweş li ber çavan radixe. Nivîskar, weke moriyekî, hêdî hêdî di nav çêre û kulîlkên welêt de rêveçûye û çavdêriyên xwe bi me re parve kiriye. Mere dema vê pirtûkê dixwîne gazinca Ehmedê Xanê tê bîra meriv. Sedemên bêwariya me, wek sûreke sar a serhedê ser û çavê me dihêrrişîne. Meriv dikare di derbarê dîmena giştî de (çi erênî, çi neyênî), gelek tiştan bibêje. Em vêga wêneyê giştî bidin aliyeî û berê xwe bidin hin kêmasiyên ku di nava pirtûkê de rûdane.


Dubare=1:

Rûpel=16: "Wexta li Guhera Mandelê datanîn, di hundirê kon de du bîr dihatin kolan, yek li hêla odeyê, yek li hêla malê, her du bîr jî avên wan mîna cemedê bûn." Rûpel=91: "Ebra paşayê Milan hersal li guhera mandelê datanî... Havînê di bin kon de, yek li hêla malê, yek li hêla odeyê du bîr vedidan. Ava wan bîran mîna cemedê bû."

Dubare=2

Rûpel=73: "Temrî paşa biryar dabû Wêranşarê bi navend bike û kela kevin nû dikir. Ji bo xwe jî cihê qesrek nîşan dikir. Hosta Yanê ji Siwêrekê, Hosta Agop ji Diyarbekirê hatibûn. Lêkirina kelê dest pê kiribû...."

Rûpel=176: Paşa yê Milan Wêranşar ji xwe re kiribû naved. Li Wêranşarê xirbeyê keleyek kevin hebû, Paşa nû vekir. Ji xwe re qesrek çêkir...."



Rûpel=281: "Wêranşar abad kir û kir paytexta xwe. Ji bajarên mezin gelek hosta û hunermend anîn. Xirbeyê kelê rakir ser lingan û ji xwe re kir hesar, diwarê wê nûve kirin û bilind kirin. Di nav de ji malbata xwe re qesrek çêkir."

Xwe ji bîr kirin:

Rûpel=121: "Nêzikî li peyê kir, peya jî bi dengê xişîna pêlavên wî re li Dewrêş hay bû, veciniqî û bi şûn de fetilî li Dewrêş mêze kir. (ka em binêrin piştî çend rêzikan nivîskar ji me re çi dibê?) Peyayê xerîb ji mêzekirina ebrê, Dewrêş ferq nekiribû." Tenê dibêjim bêlome be!

Di beşa bi navê "TALAN AJOTIN" de:

Navbera Milan û Qeregêçiyar tune. Paşayê Milan, diçe serdanekê; dema vegeerê rastî pezê Qeregêçiyar tîn; pez talan dikan, da ku bi rêya talanê Qeregêçiyar mejbûr bikin bînin ser cila xwe, li hev bîn û bibin aligirê hev – lê mixabin, nivîskar xwe ji bîr dike û êdî bi tu awayî behsa wê buyerê nayê kirin.

WÊNE'YÊ KU LI DÎROKA ROMANÊ NEHATIYE-NEBÛYE

Rûpel=85: "Zaroyên xwe pir bi nişmî elimandibûn. Zaro sibehê ji xew radibûn serçavên xwe dişûştin. Berî nanxwarinê û di pey nanxwarinê de destên xwe dişûştin. Gava fêkî, trî, kalik û şêraniyê û tiştên din bixwarana divê ku destên xwe bi sabûnê bişûştana." Em rastnivîsa hevokan bidin aliyekî, tu divê qey nivîskar qala îro dike.

Hin hevokên ecêb:

Rûpel=83: "Dewrêş, ji makezayî de bi zend û bend bû." Rûpel=93: "Pez berê di golek mezin de dihat şûştin, xwêdan û qilêra salek ji wan diçû, ziwa dibûn: Rengê hiriye mîna berfê, mîna sedefê dibiriqî, paşê dihat birîn." Gelo hiriya miya qer û mor jî mîna sedefê dibiriqîn?

Rûpel=139: "Paşê tev rûniştin, av, dew û di pey re çaya kelandî hat cem wan." Kê çay anî? Gelo wê demê jî wek vê dema postmodern çaya cemedî hebû?

Rûpel=140: "Ciwanan bi situyê mezinên xwe girtibûn anîbûn cem hespan." Şaş fêmnekin kesî kes dîl negirtiye. Nivîskarê me bi vê hevoka newaze, dixwaze ji me re bibêje; ciwanan (ji bo mezinên wan ji wan re hespan bikirin) bi zorê mezinên xwe tînin mazata hespan

PEYV:

Qelî: bûye "qawirme".

To: bûye "qeymax."

Ji ferhenga nivîskar=Dangî: wexta mêjandina kar û berxan. Li serhedê em peyva "dangî" ji bo cihê ku zivistanan giya li derve li ser berfê didin sewalan, bikartînin. Dema berx h'îlî dibin û êdî

hêdî hêdî ji şîr tîn vekirin, hew hefteyê carekê pez û berxan berdidin nav hev û danekî bi hev re dişînin çêrê, ji bo wê em dibêjin “Bermak.” Nivîskar jî di nava pirtûkê de di heman wateyê de “dangî” bikartîne. Îdiayeke min nîne, ku ev peyv şaş hatiye bikaranîn – lê ez dibêjim li gor min peyva “bermak” bêhtir li rewşa heyî tê. Kêmasiyek din a berbiçav ev e, ku hîç nivîskar lê hay nebûye: Temir Paşayê Milan, ji bo bikaribin bi Şamir re serî bikişînin qîza xwe Edûlê derdixwe mezatê, tu kesê Milî newêre qehweyê ji destê Edûlê vexwe. Dişînin pey Dewrêş, ew tê qehweyê vedixwe û hevalên xwe yê şer diyar dike. Dema Sadûnê bira dişîne pey şervanên ciwan ên Milan î bi nav û deng, her çî hîkmet e, haya wan ji wê mezatê nîne. Li hin cîhan mere dibêje qey nivîskar di nava destanê-romanê de ye; ev jî dibe sedem ku pirsek wiha tûşî mejiyê meriv bibe: Gelo ev roman e, an berhevkirinek e? Bila bersîva pirsê me bimîne ji rexnegirên kurd re.

Encam: Bi tevî mînakên min li jor destnîşan kirin jî, ev roman, welew destan hêjayî xwendinê ye. Meriv dikare di gelek hêlan de sûdê jê werbigire.

LI PERAVÊN TORÊ TORÊN EVÎNÊ

Romana bi navê “Li Peravên Torê Torên Evînê” pirtûka yekem a nivîskara jin Çidem BARAN’ê ye. Roman, ji 120 rûpelan pêk tê û di sala 2011’an de, ji Weşanên Ronahî derçûye. Mijara romanê, jiyana serokeşîra gundê Dêwan, Pêrûza Dêwanî û nakokiyên jiyana gundiyan û evîna Wensa û Salih û ‘Beko’tiya destbirakê Salih, Emero, vedibêje. Şeş rûpelên destpêkê, di nava xwedubarekirinê de her diçerixe. Ez ê hewil bidim, şaşiyên ku hatine kirin destnîşan bikim û paşê wek xwendevanek kurmancî, valahiyên di nava pirtûkê de xwe dane der, binivisim.

Rûpel 16, rêzika 6’an: “Ava ku pê cil dişûştin ango arava van cilên xwe didan ajalên xwe”

Arav; ava bi sabûn e, ji bo sewalan zirar e. Tu gundî arava cilan nade sewalan. Ma sabûn, torsêl û hwd ne di xwe de kîmyasalan dihebine.

Rûp 17, rêzika duyem: “Wê gavê birînên wê yên qûmuşgirtî diqelişin, xwîn bêhemdê wê ji birînên wê diherikîn ser dilê wê...”

Birîn ji xwe qelaştîye, qemûkgirtîye, ji nû ve naqelişe. Tenê xwîn dibe, dieciqe.

Rûp19, rêzika13’yan: “Her ku di nava salan de diçûn reha wan jî dirêj dibû û diket devê wan”.


Simbêlên mirov dikevin devê mirov, ne reh (rî, rû). Reha mirov dikeve ser dil, zik.

Heman rûpel, paragrafa duyem... “Ehmedê Birahîm, Eliyê Hêvik, Hesenê Siltanê, Hecîkê Mehmûd, Mehmûdê Şero, Silêmanê Yûsif, Hesenê Şêxmûs mexelê xwe mîna her tim xweş kiribûn.”

Vebêj, ango çîrokbêj, nivîskar e. Nivîskar, heqaretê li qereqterên xwe -li gundiyan- dike, wan dişibîne sewalan. .Mexel: Sewal mexel dibin ne însan. Mexel ango sewalên veketine.

Rûp25, rêzika 8 an: "Sitiyê wê rojê xwe li ber wê berfa dijar negirtibû û giyanê xwe ji dest dabû." Sitî: navê kera çerçî-etar-yê bi navê Qoro ye. Çîrokbêj, dîsa nivîskar e. "Însan jiyana xwe ji dest didin ne sewal." Nivîskar dixwaze bi me bide fêmkirin ku Qoro yê çerçî ji jina xwe bêhtir ji kera xwe hez dike. Ne Qoro lê nivîskar dibêje Sitiyê jiyana xwe ji dest daye.

Rûp 34, paragrafa duyem, rêzika 4 an: Birahîm ji Salih dipirse:" Di serê me de sed pirs diçin û tên. Gelo berazan deh li te dan tu bi ber jêra newalê ve xindirî? Gelo hirçeke teredînî leqayî te hat



û bi hovîtiya xwe ew ecêbmayin anî serê te? Ew karên hemeqî karên hirça ne" Nivîskar di vir de peyvên tirredîn kiriye. Madem sed pirs di serê qerqter de diçin û tîn, îja çilo zane ku wî karê ehmeqî karê hirçan e? Piştî ku Birahîm bûyerê ji devê Salih hîn dibe, di rûpelê 41 ê, rêzika 4 an de, dîsa bi xwe bersîva wan pirsên xwe dide: "Laşê te mîna diwarekî seyandî bi keviran hatibû dorpêçkirin û laşê te mîna cehê ku bikeve ber devê çekçeçoka aş hatibû pelixandin..." Heman rûpel, paragrafa duyem: "Kirîvê Saliho ma kes heye ku para xwe ji wê elbê nehilgirtibe?" Kirîvê Salih, ne Saliho ye, denglêkirin şaşê. Ji elbê tê hilçinandin ne tê hilgirtin.

Di rûpelê 47 an de, nivîskarê bi vegotina xwe, agirekî gurr di dilê Salih de dadide, lê piştî çend kêliyan, Salih derewa vebêj eşkere dike. Di rûpelê 48 an, rêzika 5 an de dibêje: "Ey roj zû derkeve dilê min î mîna ava Çiyayê Qereşê cemidî germ bike û qeşaya dilê min bihelîne."

Rûpel 51, rêzika 9 an: Qoro yê çerçî, ji Salih re dibêje. "Binêre Sitiyê jî bêriya te kiriye." Sitiya me ya ku miribû -pardon jiyana xwe ji dest dabû- waye xuliqî ye. Nivîskarê xwe ji bîr kiriye. Di rûpelê 68 an de, xelkê gundê Torê, tev çûne serxweşiya kera Pêrûza Dêwanî, ev jî sosreteke nedîtî ye. Gundî û serekeşîr ewqas jî exmeq in qey?

Rûpel 52, rêza yekem: "Xanima min, Salihê Rehîma serê kera min şikand û kengê ez bêm gund zarokên gund teva tomar dike û ji min re dibêjin Qoro! Qoro! Qoro!.."Maşalleh kurdan dest bi tomarkirina zarokan jî kirine. Êdî em ji xwe re li ber qompîtur'an rûnin û zarokan tomar bikin, dinyayê tev de bikin Kurd. TOMAR: Qeydkirin. Di vê navberê de, Sitiya me gihîşt xwe û bû ker, bi destê xwediyê xwe.

Rûpel 62, rêzika yekem: "Xwişkeke wî li gundê Bamizrût zewicibû. Her ku diçû serek dida xwişka xwe bê mala Pêrûza Dêwanî venedigeriya." Nivîskar, navê gundan tevlihev kiriye. Pêrûza Dêwanî, li gundê Dêwan rûdine. Lê xwişka mêvanê me, li gundê Bamizrût'ê li mêr e. Çawa dibe, mêvanê me bê yî ku gundan biguhere, ji malekê diçe mala din!

Rûpel 88, paragrafa dawî rêzika duyem: "Salih ji deya xwe ya ku ketibû ser kalaxê qumaşekî hîzar û nexş çêdikirin re got." Kelax; ji bo sewala ku ji ber nexweşiyê zeyif ketî bûye hestî û çerm têtgotin.

Encam: Zimanê nivîkar, sade û hêrikbar e; bi biwêjan têt û tije ye. Xwezî zimanê çîrokbêj -ango vebêj- ji zimanê qereqteran cûdatir û bêhtir hûnandî bûya. Zimanê dîwan û civata gundan, qels dimîne gelek caran. Carna di civatên gundan de zimanek ewqas bilind û hûnandî têt bikaranin, ez bawerim hê gelek nivîskarên me xwe negihîştine wê radeyê. Gundî, tev de nezan û neyarên hev in di romanê de; heta melayên wan jî nezan in. Nivîskar hewil dide ku nûjeniya serokeşira jin şanî me bide -ango ji mêrên dilhişk û gawir, veqetîne-. Serokeşîra me, heta bi kullekên gundiyan re mijûl e. Lê dema dor têt keça wê, ji bo zewacê, hîç hewce nabîne ku ji keça xwe bipirse, bê ka dixwazî bizewicî an na. Nivîskar, serokeşîrê dişibîne hîvê, wê sersariya wê ya heyatî, jê re dike qisûrek biçûk û ew qisûr jî, dibe sedemê xwexendiqandina keça wê, Wesna yê; ji ber wê êşa

trajedik, Pêrûza dêwanî, 7 salan bawî dimîne -nikare ji erdê rabe- heta dimire. Em di pirtûkê de pê dihesin ku serokeşîra nûjen, berdilkê (hê qîz e) xwe yê Ermen, ji ber dexesî û nezaniya eşîretan, bi awayekî trajîk wenda dike; bê yî ku bigihîjin hev. Dûrre mêrê xwe Eliyê Mûsa, -stûna eşîra Dêwan- bi gulleyeke ku kes nizane ji ku hatiye, wenda dike. Ango Pêrûza Dêwanî, bi êşa dil hatiye sotin; lê ew keçîka ji berdilkê wê jê re emanet maye, hîç ne li ser bala wê ye. Serokeşîra me, daw û dozan digêrîne; çî li kê, di kîjan gundî de qewimî, xwe diavêjin ber derê wê. Ewqas demoqrat e ku keçên xwe dide mêrên xizan. Keç û xortên hevdu direvînin xwe diavêjin bextê wê. Lê çavên wê keça wê (ya bi qewlê nivîskar heft roj û heft şevan digrî çav li xwe dike tasa xwînê) nabîne. Di daweta qîza xwe de, serê kêliyê kincan diguhere, ji kêfan nizane bê çî bike; lê nayê heşê wê ku dîsa ji qîza xwe bipirse. Li gor min valahiyeke berbiçav jî ev e, ku hîç nivîskar lê hay nebûye; Marogê ku Salih ji mirinê xelas kiriye, bi mehan di mala xwe de tedawî dike, lê roja Salih êdî dixwaze berê xwe bide Wensa ya berdilê xwe û gundê xwe, wî bi tena serê xwe dike rê û dişîne mala wî; bi wî halê kulek. Ma kê bihîstiyê mirov mêvanê xwe yê ji mirinê filitî û hê baş nikare bimeşe, bi tena serê xwe, bi peyatî bike rê! Tew neyarekî wî jî hebe. Hîç behsa malbata Emero nayê kirin; bav û diya wî kîne, çawa ne! Kê Wensa ji Emero re xwest û bi çî halî xwest? Wensa ya di şeva deweta xwe de digirî û dilorîne, gelo çima qet li ber xwe neda, hîç ji wê zewacê re deng nekîr? Ev jî kêmasiyeke li gor min. Niha hinek ji we wê bêjin, ê bavê mino, te jî wek dozgerê tirk qelem girtiye destê xwe û bi nava rûpelan ketiyî. Li gor min êdî dem hatiye em xwînêrên kurmançî serê pênuşên xwe tûj bikin û kêmasî, an başiyên berhemana binivîsînan. Ev êdî deynê me xwînêran e; em mejbûr in ku binivîsînan, da ku nivîskarên me jî roj bi roj asoyê zimanê me bibiriqînin. Kêmasî, an jî şaşiyên (li gor min) min li jor destnîşan kirin, kêmasiyên ciddî ne ji bo edebiyata me. Xwezî berî ku pirtûk derbiçûya, nivîskar bixwe çend caran di ber çavan re derbas bikira, an jî berhema xwe ji çend nivîskaran re bişanda, da ku ew kêmasiyên serrastkirina wan mumkûn bûn, serrast bikirana û me jî çêj'ek ji pirtûkê bistenda. Kêmasiyeke duyem jî, a weşanxanê ye. Gelo hîç ji bo redakteyê di ber çavan re derbas nekirin. Hîç li nivîskar venegeriyan, negotin di van deran de kêmasî û qelsî hene? Ma em ne di serdema teknolojîk de dijîn? Ma xwe gîhandina nivîskar û weşanxaneyê ewqas zehmet e gelo? Hîç behsa rastnivîsê nakim; ew jî mijareke din e.

Bi hêviya berhemên nû.

APORÎA: GALEGALA BINHIŞÎ A BÊ SER Û BER

Bi geztina sêvê re te'ama qedexe xwe bera cest û rihê insên da. Ji wê rojê heta niha mijarên ku herî zêde însan bilî xwe kiriye yek jî jê pevşabûn e. Pevşabûn hem ji bo berdewamiya giyandaran hem jî ji bo vemirina hêza şehwetî zarûretek jênager e. Cotbûn welew têkîliya zayendî, li gor bîr û bawerî û çandan biguhere jî herdem bi sînoran re rû bi rû maye. "Şerrê" di navbera qedexeyan û şewhetê de pirrî caran bûye sedema aloziyên rihî.

Nivîskar, bi zimanê xwe yê çalak ê bêqeyd û bend vê mijara nazik datîne navenda romanê. Karakterê/n ku xwîner li dû (bi) xwe (re) digerine, perda rû qetandiye. Karakter li ser piştê vezeliyayî, dest li nav şeşan, çav girtî, ji bo berdewamiya "ereksiyon"ê bi nav xeyalan dikeve. Karakter, tu rê, rêbaz û tabûyan nanase/nanasin. "Qorrimê Xurriî"; dibe ku Enkî, Enkudo, nivîskar û herkes be, an ne kesek be. Di metnê de zeman û mekan nîn in. Do û îro di zik hev de govendê digerin. Mirov wexta bi hûngilî dêhna xwe dide hersê romanên nivîskêr, mirov dikare di çawa gotinê de bi rehetî bibêje nivîskêr cila xwe ji avê derxistiye. Mijarên hersê romanên ne dûrî hev in; li vir pirs xwe didin der: Heger li gel "çawa gotinê", "çi hatiye/tê gotin" xwe nû neke, wê xwîner berhemên bê meraq bikin gelo? Nivîskêr ji xwendina berhemên û berhemên bi xwe nûsîne, romanek nivîsî ye. Bi vekirina "deriyê" berhemê re H.Kovan Baqî xwendeyên xwe li cila peyvê siwar dike heta metin diqede. Metna li ber dest xwedî çîrokek yekpare nîn e. Metin di labîrentên hiş û binhişî de xwendeyan bi teqala xwe dixê. Cî bi cî nivîskar şekirokan belav bike jî, wê her xwîner nikaribe bi dû metnê bikeve.

Aporîa / H.Kovan Baqî / Weşanên NA




PERDE ROMANEKE BAJARÎ YE

Perde; sêyemîn romana Cîhan Roj e û yekem romana ji weşanên NA'yê derçûye. Roj, dîsa bi zimanê xwe yê sade li belekiyan dibişire. Piştî xwe daye helbestê û qiblegeh însan e. "Gîtara bê têt" û "Meşa moriyan", di bin siya "Perde"yê de mane.

Perde, bi teknîka xwe nûye nûcan e. Vebêjê pirtûkê qereqtera bi navê Gulten e. Gulten, endama malbateke bûrjûwaya kurd e. Keça têkoşerekî di bin zilma dewletê û sersarî û dilhişkiya hevalên xwe de eciqiye.

Roj, di kesayetiya Gultenê de, 'Perde'ya qîzaniyê çirandiye; jin û mêr aniye heman astê. Perde, çemeke û dilop bi dilop ji lêvên Gultenê diniqute. Her dilop têra xwe bi bûyeran dagirtiye. Roj, civak, rêxistin û kesan, bi vegotina jiyana qereqterên xwe re dide ber rexneyan. Em ne xerîbên bûyer û qewmînan in; kê m zêde haya her kesî jê heye... Bi nivîsandina vê berhemê re em dikarin bibêjin, me kurdan wekî takekes, civak, xelk, gel, an ji millet, gelek rê li dû xwe hiştiye; êdî dem hatiye em kumê xwe bidin pêşiya xwe hûr û kûr li ser rewşa xwe a heyî bîponijin û bigengeşin. Bê guman tu berhemeke bêbîrdozî û bêalî nîn e. Roj, pala xwe daye vê gotina



Vartoyî; 'dema merû dibêje însan ava çem û kaniyan disekine' û dest bi hûnandina berhema xwe kiriye. Kurtêlxwariya şer, bi pêkenokekê li ber çavan radixe, bê ku bikeve dû analîzên dûv û dirêj. Ev berhema, ji bo roj jî bawer im ceribandinek e; ji qelama mêrekî, (bi devê jinekê) vegotina rihê a jinekê. Gelo di vê vegotina rihê a jinê de, nivîskar çî qas serketiye? Divê bersiva vê pirsê ne mêr lê jin bidin.

Piştî ku pirtûk xwînêr digre nava pêlên xwe, wekî ku merû li hêwaneke şanoyê be, misêwa perde vebin û bên girtin, vebin û bên girtin vebin û...

Ji çend perdeyan carekê Woolf derdikeve ser dikê, dîmenên derbasbûyî bi çend hevokên tîr vedibêje û vedikişe şûna xwe. Gelo Woolf dernekeve ser dikê wê berhem tişteki ji xwe kêmbike? Ez ne bawerim. Bawerim nivîskêr, Woolf ji ber du sedeman tevî berhema xwe kiriye:

1: Nivîskar, xweziya xwe bi Woolf tîne, lê taqet bi qereqter re nîn e, nikare bibe Woolf.

2: Ji xwînêr re dibêje, ger şert û mercên heyî nebûyan, min an jî me bikaribûya bi wî terhî binivîsanda; welew, çima qereqterên me nikaribin bibin Woolf.

Di dawiya 'Perde'yê de, nivîskar bi suprîzekê derdikeve pêşberî xwînêrên xwe; du leheng, welew qereqterên bi navê doxtor Şadî (karakterê Gitara bêtêl) û Mîralî (Karakterê Meşa moriyan) tevî romanê dike. Di qezayeke trafikê de doktor Şadî dikuje û Mîralî jî dike nexweşekî di terqîna mirinê de. Ez bawerim nivîskar, ji bo ku doxtor dev ji pîşeya xwe berdaye û çav berdaye siyasetê, wî dikuje.

Nivîskar, di beşa pîneya Perde'yê de, behsa serboriya xwe a dema nivîsandina pirtûkê dike û êş û zehmetiyên ku nivîskar dikişînin tîne zimên; ev jî nûbûneke ji bo qada romana kurd.

Ji bo nivîs dirêj nebe, çend hêlên romanê di bin serenavan de bi bîr dixim û dawî li nivîsa xwe tînim.

Baqî: Lehengê di bin siya bîrdoziya xwe de pelixî.

Sazbend: Sazbendê ku nebûye hunermend.

Maqûl: Qurbanê xwedayên sererd û binerd.

Dengbêj: Hewara jibîrbûyîyan, derdê bêderman (sersariya kurdan û bextreşîya hunermendan).

Lezbiyen: Binhişê lezbiyentiyê

Lixwexweşanîna jinê: Binhiş û masturbasyon.

Pismamê Gultenê: Civaknasê nêr.

Serkeftina nivîskêr a herî mezin ew e ku xwedî zimanekî sade û nerm e. Mijarên herî nazik digire dest; gotina xwe texsîr nake. Ji analîzan bêhtir, bibîrdixe û derbas dibe. Erka xwe ya rewşenbîriyê tîne cih. Wekî pêşîyan gotiye: Gotin adet e, lê jênexwarin serbest e.

Ji hestên ku xwendina Perde'yê li şûna şopa xwe hiştiye:

Ey welatê başvala

Em ê bixwînin derya xwînê

Ta ku

Zanîn di nezaniyê de

Wîjdan di bêwijdaniyê de

Pîrozahî di bin simê xerabiyê de pelixî

MISTEK JIYAN

Divê gotina dawî were gotin! Ez ê di destpêkê de destnîşan bikim û xwe berdim nava rehê pirtûka çîrokan a çîroknûsê kurd Çiya Mazî. Ez dixwazim bê fêmkirin ku ez ne rexnegir im; xwînerêkî şît im û heta ji min tê naxwazim kitekitek jî, ji metnekê, ji ber çavên min bisilike. ‘Mistek Jiyan’, pirtûka yekem a Çiya Mazî ye. Pirtûk, di sala 2003’yan de, ji Weşanên Sî derçûye. 149 rûpel e û ji 16 çîrokan pêk tê.

Çavê kor dinyê nabîne:

Mijara vê çîrokê, nezaniya gundiyan e. Çavê qereqterê sereke Milahîm, diêşe. Ji ber nezaniyê naçe ba doxtoran; ketiye dû dermanên kurmancî. Ji ber nezaniyê, her tişt tê serê Milahîm ê me. Her cûre dermanê ji gîhayê dicêribine; di serencamê de, kor dibe. Hiş tê serî lê êdî pir dereng e. Vebijêr, nivîskar e û serê hespê xwe berdaye, lê hespê nivîskar dizgîn ji destê nivîskêr girtiye. Apê Milahîm, Milahîmê me yê sewsî dişîne ba kalê zeytûnî, ji bo şifayê; dermanê kalê zeytûnî, pûng e. Berê, pûngê dicêribine çav baş nabin. Dûre, Milahîm dikeve tora şivanan û şeb ê bikartine; çav, perîşan dibin. Welhasil, gundî êdî tev bi rewşa qereqterê me hesiyane. Her yek dermanekî destnîşan dike. Em ê zêde nekevin dû dermên, serencam diyare. Ka em binêrin nivîskar çawa li dû hespê xwe kaş û berkaş dibe. Rûp 11, paragrafa dawî: “Kuro ma kê got pûng dermanê çavan e? De bi xwedê derew e. Ma qey nayê bîra te pîrika min Zero, xwîna genê bera çavê zarokan dida.” Doxtorê me yê gundî, hewildide ku Milahîm dermanê wî genê biheciqîne û xwîna wî bike çavê xwe, ji bo êşa çavê Milahîm bisekine. Tiştê hewceyî gotinê ye, nivîskar û doxtorê me, xwe ji bîrvekirine ku profê me pisporê gîhayêye, ne ê genê. Ka em binêrin profê me, ji bo Milahîm qaneh bike çi dike. Rûp 12, rêzik 14: “.... Ma ne ew kitêba bavê min ji min re hiştibû, sê sed û sih û sê rûpel in. Bi sê sed û sih û sê Qur’anan, kitêb di ser re tune. Bi navê xwedê ez dibêjim ji quranê hatiye girtin. Heçî giyyayê dinyê giş tê de hene. Lokman û hekîm wê nexwînin nabe. Min ji wê derê darsa xwe stendiye bavo, guh li min bike.” Rûp 13: Nivîskar, dîsa xwe ji bîr dike û tevli diyalogan dibe. Pismamê Milahîm li Enqerê dixwîne, tê serdana Milahîm. Diyalog dirêj in, ez ê wan kurt bibirim:



" - Kuro ma tu carî toxtor nayê bira te ku tu herî ba wî?

- Na lo ma toxtor çî ye, em Kurmancê reş in loo..!

- tu Kurmancê weş î.

- Weh ma tu ne Kurmancî law?

- Belê ez Kurmanc im û sed carî jî Kurmanc im...

Xwendekar:

- Na!divê tu herî tixto... "

Haya niviskêr, piştî ewqas diyalogan jê çê bû ku xwendekar heye. Rup 14, rêzik 12: "Xwûşka Milahîm bi israr, divê gerek tu herî ba Dirano ji bo dermanê sor." Di vir de tu pirsgirêk tune; lê dîsa vebêjer –nivîskar- xwe ji bîr dike û qerfê xwe bi qereqterê xwe dike. Nivîskar, li tu derê behsa profesorî û loqmaniya Dirano nake, ta ku dema pê qerfên xwe bike. Li wir jî nasekine, qerfên xwe bi hesabgirê Dirano dike û hesabgir jî dike mîstir. Ka em berdewam bikin bi nivîskêr re.

" Te digot qey fakûlteya Amedê ye, ketibûn rêzê. Pertavê Milahîm bilind bûbûn û digot "îcar raste ha. Bi xwedê îcar çavê min ê rehet bibe." Bi hetîketiyekê xwe gihand ber deriyê Şx. Lq.Dr.Dirano(şêx Loqman Doktor Dirano)." Rûpel 15, rêzika 24 an: "Miayena wî xelas kiribû û derman ji dabuyê. Lê dawiyê Dr. Dirano bi dengê nizm: "Lê tu çû Mehmûd bibine û here ha..." Hê nepirsî bû ku Mehmûd kî ye, yê berdest bi milê wî girt û kişand alî hêwanê. Bire ba hesabgirê wî Mr. Mmehmûd. Piştî du diyalogan. Mîster Mehmût pere stendin û oxir kir." Mehmûd jî di vê navberê de bû Mehmût. (Mimkûn e ev xeletiya redaktor-edîtor be).

"Çavê te kor be xerîbî"; çîroka êşa malbeteke kurd a ji ber zilma dewletê, koçî metrepola Îzmîr ê kiriye. Dîsa vebêjer nivîskar e; rûpel 19, paragrafa duyem, rêzika 4 an: "...Serdar jî heft sal giş bi tirs " Wê kengî bavê min bibin" derbas bûbû. (ji dêvla "bûbû", gere "kiribû" ya) Di wî emrê xwe yî biçûk, li nêviyê erdnîgariya Enedolê geriya bû." Ji hevokên jor jî diyar e ku zarok heftsalî ye û dizane wê rojekê dewlet were bavê wî bibe. Em vêga Serdar li vir bihêlin û derbasî çîroka xwe bibin; em ê paşê binêrin ka Serdar fêhm dike an na.

Rûpel 21, rêzika 15 an: "Hê nû nêzî daran bûbûn û li dora xwe dinihêrîn, ji nedîtî bavê wan derket hemberî wan... Her duyan jî xwe çengî hewa kirin û bi qêrîn: "Bavooo... bavooo.! ha bavoo!" Li vir diyare bavê wan ji nişka ve derketiye hemberî wan û nêzî hev in. Nivîskar, gelek hestiyar e û çîrokê ew kiriye binê hikmê xwe. Tu divê qey em di nava filmekî yeşil çam ê de ne. Direvin narevin nagihîjin hev. Piştî 6 rêzikan, em berdewam bikin: Wan baz dan û bavê wan bazda. Hatibûn nêzî hevdu. Bavê wan li pêşiya wan çong vedabû û herdû destê xwe vekiribûn.

Herduyan jî bi peroş xwe avêtin himbêza bavê xwe.” Bavê zarokan û zarok gihîştin konê xwe û ketin nava gilî û gazincan. Di rûpelê 23 an de, ji rêzika 21 ê şûnde, nivîskar xwe ji bîr dike û radibe dersê dide xwînêran:

Jina wî bi hêrs: “Lê kî yê alî min bike giş herin mektebê?” Newal him hêsir dibarand û him jî xîzîna qirikê: “Ê lê çima ev diherin? De bi xwedê ez ê jî herim ha.” Tim û tim yê li paş diman qîz bûn li vê derê jî. Dîsa xemginî bi ser Newala qîz de hatibû û ew jî wekî pîrên qîzan bêyî xwendin bimaya. “Xwendin û bixwendinkirin pêşverûtiya herî mezin e.” Me dersa xwe girt ne! De em berdewam bikin: Derengî şevê, di bin baranê de, di konê xwe de, serî dane xewê hemûyan, wê qasekî din, polêsê tirk werin, bavê zarokan Brahîm desteser bike bibe her e. Di rûpel 24, dawiya paragrafa 4 an de, polês dipirsin: “Brahîm tu yî kuro?” Piştî du rêzikan, em ê bersivê bigrin, “Belê ez im.” Hûn ê bêjin ma çi heye di vir de! Belê, yên di ser kon de girtine polêsên tirk in û tirkiya Brahîm, Îbrahîm e; lê hatine îmanê û bi kurdî bangî Brahîm dikin.

Rûpel 25, paragrafa dawî, rêza 2 an: “Jina wî û zarokên wî bi tirs li bavê xwe dinihêrîn”. Li vir jî, jina Brahîm li mêrê xwe -pardon li bavê xwe- dinêre ji tirs polêsan. Heman rûpel, piştî sê rêzikan: “Kes jî tunebû ku wê şeva û li wê çola, alî wan bikin an dilê wan xweş bikin.” Em dev ji rastî û çewtiya hevokê berdin; kêma xerab em pê hesiyar ku kon li çolê ye, tu kesek -an cînar ek- li dor wan nîn e. Çend kêliyan xwe ji bîr mekin, em ê bersiva xwe di rûpela 27 an de bistînin.

Rûpel 26, paragraf 2, rêzika 2 an: “Yên mezin hinekî tê digihîştin ku hatine bavê wan, lê Serdar baş fêma nedikir.” Rûpel 27, rêzika 1 ê: (Em bersiva xwe bigrin dawî li çîroka xwe bînin.) “Ka hela em herin mala cîranê Hesên bê telefon nake... Belê stûna mala wan ji nava wan çûbû. Hetanî sibehê raneketin. Tenê ji çend heb konên cîran jî re gotibûn.” Êdî tirs hewce nake cîran ji kon jî hatin dîtin.

“Wey gewrê wey”:

Wek ji nav jî diyar e, mijara çîrokê Gewrê ye. Gewrê, bi malbatî ji ber zilma dewletê ji welatê xwe koçber bûye. Gewrê karkerê pembo ye. Rojekê, dema li zeviya pembo, çavê wê li lawê patron dikeve, bi heft dilan dil berdidiyê. Di dilê xwe de qerarê dide ku wî bike mêvanê sîng û berê xwe. Di serencamê de, lêwîk ji xwe re direvine û li malxalê xwe dibe mêvan. Xal, wan dişîne holîka nêçirvanan a li çiyê. Gewrê, şeva yekem qîzaniya xwe dide Serdar. Lawê xalê wê, dema ji devê wê dibihîze ku şeva çûyî qîzaniya xwe wenda kiriye diqehire. Em û Gewrê, wê gavê pêdihesin ku Cano yê kurxal jî çav berdaye wê. Êdî Gewrê dizane wê Serdar jê re nebe mêr; radibe bê yî ku dek û dolaban li hev bigerine, herdu mêran qaneh dike ku herdu jî bi wê re bizewicin. Bi dorê, ma’ra hevdu li wê dibirrin û herdu jî dibin mêrên wê. Rûdinin û nameyekê ji civaka heyî re dinivîsin. “Em: Gewrê, Serdar û Cano, ji bo heta niha rêz ji jinê re nehatiye girtin... em hersê zewicî ne... bi tarî ketina rûyê erdê re polês dora wan dorpêç dikin û wan dişînin dadgehê.” Bi kurt û kurmancî çîrok ev e!

Di mekên de tevlihevî heye. Gewrê, ji berdilkê xwe re dibêje, lawikê Stenbolî û em jî ji wê fêm dikin ku Serdar bi malbata xwe re li wir rûdinê. Lê dema dest bi revê dikin, em xwe ji nişka ve li ber çemê Mendresê dibinin. (Çemê mendresê li EGE ye ye) Gewrê û lêzimên xwe, wek her kurdî ji ber zilma dewletê koçî metropolan kirine. Gewrê, 8 salan, (ango heta dibistana navîn) xwendiyê. Ji ber egerên heyî nexwendiyê. Çîrok, di wê atmosfera şer de pêk tê. Lehengên çîrokê, ji bilî Serdar (dibe ku ew jî kurd be, baş ne diyare) tev de kurmancên kurddarê in. Ew kurmancên ku ji bo tiliyeke goşt qirra hev radikin, serê dev û pozê jinê jêdikin û jinê dikujin. Dilê Gewrê heye ku serhildanekê pêk bine û civakê bi êşa jinê bihesîne. Her çi qas nivîskar behsa femînîzmê neke jî, hewil dide ku bi destê Gewrê'ya ku f ya femînîzimê nizane, serhildanekê femînîst pêkbîne; Lê atmosfer û mekan ne musaît in. Hela qereqter hîç musaît nînin. Ger mekan û atmosfer guhertîbana, an jî Gewrê anarşîst'ek ba, bi dek û dolaban serî li herdu mêran bigeranda, belkî nêzî rastiye ba; lê bi vî halî, çîrok gelekî beloq dimîne. Peyv-hevok, di teştê xwe de baş nehatine strandin. Nivîskar, ji ber ku bi sedem dinivîsine, xwe weke xwedayekî dibîne û dixwaze edaleta heyî sero bino bike. Ji ber nêta wazîfedariyê, çîrokê serî ji nivîskêr girtiye. Ger nivîskar hînekî ji berpirsiyarî û tolgirtinê dûr biketa, serê xwe hinekî din bi çîrokê re biêşanda, wê çîrokek xweş û bite'am derbiketa ji tûrikê wî. Nivîskar, xwediyê vehesîn û bihîstineke baş e. Mere gav bi gav di rêwîtiya xwendina çîrokên wî de, vê ya dibîne. Çi çaxa hinekî ji berpirsiyariyê dûr ketiye, peyv-hevokên wî bicoş û biruh bûne. Mînak, em dizanin Gewrê karker e û bê ku heqê xwe bistîne vedigire malê; bav jî bê pere ye, yekser pereyan jê dixwaze û bi wê rewşê aciz dibe. Ji bo revê, pereyekî ciddî lazim e; malbat û Gewrê bê pere ne; lê nivîskêr qursikên çîrokê xweş hûnandiyê. Piştî çîrok xelas dibe, gelek pirs di serê mirov de dimîne, mirov dixwe nava gumanan; vê yekê jî qawet û çêja çîrokê zêde kiriye. Dema Gewrê biryara revê dide, wê şevê di mal de dikeve nava lêgerinê, li çi digere? Em tenê texmîn dikin. Nivîskar, çîrokê xelas dike jî, dîsa xwe nade dest. Belê, Gewrê tiştêkî ji bin balgiya bavê xwe dikişîne, lê çi ye em nizanin. Tiştê ji bin balîfê dikişîne dike nava sînga xwe, (dibe ku pere be) lê em dizanin pere di mal de tune. Di çîrokê de, hew behsa devançe heye. Ger devançe be, îja gewrê pere ji ku anî û heqê texsiyê da? Çû ba dikandar çi. Çi da dikandar? Dema ji dikanê derket çima destê xwe li tûrikê xwe şidand? Di tûrik de, em paşê pêdihesin devançe heye. Gelo di mal de zêr hebûn? Gewrê çi ji bin balîfa bavê xwe derxist? Dibe ku ji dikandar pere deyn kiriye? An gelo xwe pêşkeşî dikandêr kir? Û mirov dikare gelek pirsên bê bersiv bipirse. Lê revandina Serdar û qanehkirina Cano, beloq e; (sivik e) mirov nake nava meraqan, pirsan li dû xwe nahêle. Ji ber van egeran, çîrok lawaz û bê te'am maye.

“Pîra melo”: Çîroka pîra Melo ye. Pîra me, ji jiyana nava bajêr aciz e û dixwaze derkeve çiyê, bigere û wek demên berê, bêhna xwe berde. Qîza wê ji malê reviyaye û pê hesiyaye ku keça wê, ji bo êzingan tê wan çiyên. Hêvî dike ku qîza xwe li çiyê bibine. Wexta di rêyek teng de dimeşe, di bin kera xwe de dimîne û bi awayekî trajîk dimer e.

“Çîrokeke berî 84 an”: Ev çîrok, jiyana karkerekî notirvan ê kana madenê ye. Şevêkê, berpirsiyar wan di xew da zêft dikin û wan ji kar diavêjin. Paşê jî, hêdî hêdî karkerê me berev sofftîyê ve

dimeşe. Wexta Hemdo li ber mirinê ye, bi teqîna 84 an re, di 63 saliya xwe de, bi kêfxweşî berê xwe dide çiyê. Di dawiya çîrokê de, dîsa nivîskar berê me dide siyasetê û dilê xwe li berpirsiyariyê rehet dike.

“Darikê mirada”:

Çîrokek bi te’ahm e; lê dîsa weke hercarê, ji ber bîrdozî, wazîfedarî û tolgirtinê, nivîskar nahêle çîrok li baskan bikev e. Ji ber ku hestiyarî û dilsoziyê ew dîl girtiye, haya wî jê çênabe ku qerfê xwe bi qereqterê çîrokê dike. (Weke hercarê, dîsa çîrokbêj nivîskar e)Rûpel 62, paragrafa 4 an: “Dibêjin “Keran li ba hev girê nedin wê ji hevdu hînê tir û fisan bibin” Jina wî ji wekî wî bû. Qey li hin deveran dîbû ku ev rojname qala Kurdan dike û dewlet jê hez nake...”

Rûpel 66, paragrafa 2 an, rêzika 3 yem: Mehmût dibistana mezin xelas kiribû ji,... Qasî ez

dizanim em kurd dibêjin: dibistana bilind, zanko, zaningeh lê ne dibistana mezin.

“Û radyoya min dîsa dest bi kilama kir”:

Mijara vê çîrokê, vê carê jî zilm, zor û êşkenceya ku dewlet li gundiyan dike, vedibêje. Nivîsakar, li du cîhan ji me re dibêje, xwînêrno, ha binêre yê çîrokê vedibêje zarokê heftsaliye. Lê ne mumkûn e ku zarokek bikare vê çîrokê vebêje. Nivîskar jî bi vê yekê dizane. Di dawiya çîrokê de, dixwaze me qaneh bike, lê bi ser nakeve. Di rastiya xwe de, vebêjer dîsa nivîskar e. Ji ber nivîskar bandora şerr î li derûna zarok kiriye, venabêje, raste rast çîrokê bi devê zarokê heftsali vedibêje. Ka em li hîleya nivîskêr binêrin bê çi ji me re dibêje. Rûpel 87, paragrafa dawî: “Dema min nêzikî li gund kir, tariyê dabû erd, lê radyoya Yêrevanê dîsa ji min re dest bi kilaman kiribû. Qet nedihat hişê min ku çend salên din ez ê di pirtûka yekî Tirk de, wekî ji ber êrîşên cendermeyan li gundekî Şemrexa Mêrdînê “Wenda...!” bi cîh bibim.” (Meqsed, welew xefika ku nivîskêr xwe tê werkiriye ev e.)

“Mistek jiyên dixwazim”:

Mijar, jiyana çerçîyekî (etar) ye. Ji ber êşkenceya ku leşker lê dîkin, mala xwe bar dike û koçî metrepola Îzmîtê dike. Berî ku bar bike, di kêliya dawî de, çar kîlo ax’a welatê xwe (a sor) dike kîsekî; li qemyona xwe siwar dibe û berê xwe dide xerib û xurbetê. Ew ax dibe taqet û pê li ser lingê xwe disekine, li vê dinyayê; lê dewlet, dawiya dawî nahêle ku bi wê ax’a xwe şa bibe û berê wî didin zinadanê.

“Ma qey wê dinya xera bibûya”:

Mijar, piştî xelayê ye. Êş û zehmetiyên wê demê û çîroka hewîtî’yê vedibêje. Ji ber ku kurê Emîne yê ji xelayê filitiye, berev başiyê diçe, bi kêfxweşî gilî û gazincan ji xwedê dike. Mirov qala vê çîrokê bike, wê bibe dubarebûn, loma jî hewce nake.

“Her! qomitan cerdevan”: Nivîskar, qala zilm û zora cerdevanên ku li yê dike bibe cerdevan, dike. Zilm, eynî zilm û şêwaz heman şêwaza qlasîk. Tu gotinên din ne hewce ye.

“Serpêhatiya min a ber derî”: Heyran bi serê xwe dikim, heta ez hatim vê çîrokê, hetikîm. Lê aniha dikarim gamêşan jî bidoşim; nebêjin gamêş nêr in! Wele ez ê nêran jî bidoşim, bi vê kêfê. serpêhatiya min a ber derî, çîroka herî serkeftî a vê pirtûkê ye. Nivîskar berpirsiyarî, wazifedarî, bîrdozî û tolhildan, gişt li ber derî daniye û bi peyvê dilîze, na na direqisî ne. Mirov dema vê çîrokê dixwîne mirov bi xurtbûn û jêhatîbûna nivîskêr re sermest dibe.

“Bavo”: Di vê çîrokê de, çîrokbêj weke hercarê, dîsa nivîskar e. Bi nexweşiya bav re, belaweliya malbatê, civîna wan î li ser hev û xwedîderketina li bav. Derûniya nexweş, lêzimên nexweş û nexweşxanê li ber çavê me radixe, ta ku bav dimire.

“Agir jî bilind bû”: Êşa şewata gundekî Kurdîstanê (a bi destê dewletê) bi me dide nasîn.

“Hêsirên çivîkan”: Nivîskar, di vê çîrokê de, qala roja dawî a Mehmûd ê li nexweşxanê (ku doxoran gotiye wê du sê mehên din bimire) dike.

“Lawo lêxin maro ye”: Di vê çîrokê de, behsa welatparêziyê dike. Qereqter, neyarên xwe baş dinasin; lê dîsa jî bê tedbîr in. Nivîskêr, dîsa dest ji hûnandinê berdaye û bi dû danasînê ketiye.

“Guherîn”: Mijara vê çîrokê, Qetilkirina kurdekî cîwan, (ku bi destê sofikên qontra hatiye kuştin) dike. Bi vê kuştina hov re, gel bi girseyî serî radike û qatilên zarokên xwe di nava tirsê de dihêle.

Encam: Ev pirtûka nivîskêr a yekem e. Xwezî nivîskêr ecele nekiriba ji bo weşanê û hinekî din serê xwe pê rê êşandiba. Nimûneyên wisa di vê pirtûkê de hene ku, ger nivîskêr xwe ji wezîfedarî û tolgirtinê xelas kiriba, te’am û qaweta edebî a vê pirtûkê, wê duqato zêde bûbûya.

BAHOL:

Navê pirtûka çîrokan a Çiya Mazî, ya dawî ye. Pirtûk, ji 103 rûpelan pêk tê. Di bin baskê xwe de 14 çîrokan dihebîne. Di sala 2011’an de, ji Weşanên Evrenselê derçûye. Nivîskêr, li gor pirtûka yekem gelek rê û dirb buhirandiye. Çîrokên min bêhtir jê hez kirin ev in: “Di morgê de”, “Dadgeh”, “Şervanê tirsonek”, “Însizê benderuh” û “Serpêhatiya min î ber derî”. Di morgê de û dadgeh, berdewamiya hev in. Xwezî nivîskar hinekî din li ser Dadgehê, li dîwana xweda û nebiyên wî, bisekîniya; an hinekî zor bida felsefeyê, an jî bi mizahê xurt, li dor dîwanê biçerixiya; lê dîsa jî xweş e û min tehm jê girt.

“Serpêhatiya min î ber derî”, ji pirtûka yekem hatiye girtin, hema bêje bê ku guhertinek berbiçav tê de çê be, firiya ye vir. Ji xwe ew favoriya min a pirtûka yekem bû.

AMÎDABAD

Amîdabad navê pirtûka çîrokan ya Fawaz Husênî ye. Ew 106 rûpel e û heşt çîrokan di xwe de dihewîne; di sala 2001ê de ji weşanxaneyê Avestayê derketiye.


Mijara pirtûkê êş, qirkirin û koçberiya kurdan e. Zimanê nivîskêr gelekî şîrîn e; heta dikarim bêjim, helbestî û herikbar e; lê, nivîskarê me tim xwe dubare kiriye û di gelek cihan de jî, li gor min, zor daye qalib û mantiqê. Kî dizane, belkî ez bi kurmancî nizamim û zimanê nivîskêr fêhm nakim! Ez dê hewil bidim ku bi qutûtî peyvan bibêjim û heta ji min bê ez dê "kêmasî û xwedubarekirina nivîskêr" eşkere bikim. De kerem bikin em bi hev re noqî nava rûpelan bibin.

"Koça mezin", rûp 10: "Leşkeran zikên jinên avis qelaştin, dest û lingên zarokan birrîn." Ma gelo jin "avis" dimînin? Peyva avis ji bo sewalan -pez û dewêr- tê bikaranîn ne ji bo jinê. Dema peyva avis ji bo jinê bê xebitandin, dibe peyvek argo û heqareta li jinê. Jin himil, ducan, bi zaro, zik li ber dev, bipaşil, bihalekî û hwd. Lê ne avis e. Em dibêjin jinê welidand; kûçik teliqî, mih/bizin/çêlek za.

"Qesra xewnan", rûp 22: "Wek ku wî piçûkaniya xwe li wira derbas kiribe, wî biserhatiya Qurbanên Evînê xweş nas dikir." Ka nivîskar dixwaze bêje çi? Gelo wî Qurbanên Evînê nas dikirin, yan jî bi serpêhatiya wan dizanî? Mantiqa hevokê çi ye gelo?

"Başoke", rûp 36, paragrafa dawiyê: "Helbet ne bi dilê min bû ku ez bi metroyê, bi tenha serê xwe, diçûm pêrgî Seydo." Li gor min ev hevok şaş e, ji ber ku "pergî", lêrasthatin e. Nivîskêr, peyva pêrgî di şûna pêşwazîkirinê de bi kar aniyê. Diviya hevok wisa bûya: Helbet ne bi dilê min bû ku ez bi metroyê, bi tenha serê xwe, diçûm pêrgîniya Seydo.

"Suwarê êşê", rûp 54, paragrafa duyem: "Keça ciwan li ser qûma giravekê xwe ramidandibû. Roja havîneke xweş, şaxên dareke xurma û ava deryayeke geh kesk geh şîn di bin azmanekî sayî de gîhîştibûn hev, ketibûn govenda xweşikbûn û şadiyê." Ger erda ku keçika cestqemer li ser vezeliyaye giravek be, dêmeg çarhawîrdor derya ye! Îca deryayek ji ku derket? Temam, em bêjin



derya, di bin ezmanê sayî de, geh şîn û geh kesk bû. Îca şaxên dara xurmeyan çawa geh kesk û geh şîn dibe? " Keça bedew nû ji deryayê derketibû ji ber ku dilopên avê bi hezaran li ser bedena wê mîna mîrwareyan dibiriqin". Gelo hinan pirsê ji nivîskêr kiriye ku di nava hevokê de pirsê dibersivîne û em jî ji sewsîbûna lê nevarqilin? Çi eleqeya herdu hevokan bi hev heye ku nivîskêr ew bi hev ve pîne kirine û kirine hevokeke ecêb? Nivîskêr wek terziyekî ecemî xwestiye dêriyekî bifesilîne, lê pêş (daw) û navteng li hev nakin. "Wê bi nazikî, bi dilovanî şûşeya Coca Cola nêzikî lêvên xwe dikir û di wê bihiştê de, hemû xweşiyên jiyane dikir du sê qurt". Gelo kubarê bi dilovanî -birehm, bi merhemet- şûşeya Coca Colayê nêzikî lêva xwe nekira, wê lêva şûşeyê xwaribûya qey? Tu dibêjî qey qira fanteziyan hatiye! Vebêjî heman hevokên jor ji çîroka bi navê "Dadgeh" ji rûpela 44ê anîne û dibêje de bixwin gêjno.

Rûp 57, rêzika 9ê: "Kêfa min pir ji wê saeta destan dihat ji ber ku ew diyariya dapîra min bû." Vebêjî dîsa xwe ji bîr kiriye ka em li saeta vebêjî bigerin bê vebêjî li kû saeta xwe avêtibû nava qûmê. "Qesra xewnan"; rûp 24, paragrafa dawî: "Saeta min li ber dilê min gelekî şêrîn bû, dapîra min ew ji min re ji axa Hîcazê, li derdora Kevirê Reş kirîbû." Piştî şeş rêzikan, binêrin bê saet li ku ye:" Heta ku Xwedayê ku tu carî dengê min nedîçûyê hêz dabû min, min ew saet bi dûr avêt. Saetê di azmanê nizm de kevanek çêkir û dûrî sî çil gavî di xîzê de çû xwarê." Madem saeta xwe avêtibû, îca çawa dîsa di desta de ye?

"Teyrê masiyan", rûp 72, paragrafa yekemîn:" Li meyxaneyê, ez ne yê pêşîn bûm ku min ênîşka xwe danîbû ser misa bara dirêj. Paragrafa duyemîn: Piyala pêşîn ya meya sor xwe pênc deqîqeyan li ber tîbûna min negirt. Heman rûpel rêza dawî: Min weha jî li çayxanê piyaleya sisêyan bi ser gewriya xwe (em bi vebêjî re derbasî rûpela 73yê bûn) de kir wek ku min dixwest di eynî wextê de şewatên Amîdabadê vemirînim." Vebêj ket "meyxanê" û ji "çayxanê" derket; ka em berdeyam bikin:"Min pereyên her sê piyalan da û min bi peyatî berê xwe da meydana Trocadéroyê. Ewrên reş zikê xwe bi serê darên kolanê dixurand û bayekî sar bi dû xwe ve dikişkişandin. Ez di kêleka goristana Passyê re bihurîm û li Meydana Trocadéroyê bi bayek xurt sîleyek dawêşand min. (Kê, çawa sîle dawêşand wî, wele ne ez im!) Êstegeh li wê derê bû û dilê min hebû ez xwe berdim xwarê, li kêleka camê rûnim, (ango li metroyê siwar be) lê hemû çayxaneyên meydana vekirî bûn. Serê her mehê, min dikaribû hemû ava çemê Seinê û hemû meyên başûrê Fransayê vexwarana bêyî ku tîn min bişikesta. Min di metroyê de xwe rehet didît. Kurmê hesinî bi movikên xwe yên ronî xwe di hinavê bajêr de dipêçand, ber bi taxên dûr ve diçû. Min ber bi meyxaneyê pêşîn ya meydana Trocadéroyê bezand. Rojên pêşîn ên her mehê ez bi saya vexwarinê dibûm mirovekî din, bedena min ji bedena min derdiket. Erê min didît çawa di ronahiya zîvî ya pencereyên metroyê de ez ji cîhê xwe radibûm, ji xwe dûr diketim. Lê ez tî bûm, bêpayan tî. Ji destpêka demê de, ez bi tirs bûm û tî bûm. Di tunelan de, min ber dilê xwe bi keçikan şîrîn dikir, carcaran jî min kesên derdora xwe ji bîr dikir û dev û lêvên wan keçan jî maç dikirin. (Vebêj serxweş e; ez nizamim peyaye, an di metroyê de ye hê. Piştî çar rêzikan, em bi nivîskêr re berê xwe bidin meyxanê, pardon çayxanê.) Li çayxaneyê Malakoffê, li meydana

Trocadêrayê, min carek din hewil da tîna xwe ya ebedî bişkînim. Gava ez derketim, nêzikî şûşeyeke meya sor di xwîna min û di zikê min yê vala de digeriya. Min hê xwirîniya xwe nekiribû. Ez li ser lingan dihejiyam, lê ev yek ne ewqasî giring bû. Min bi peya berê xwe da meydana Stêrikê, Kevana Serfiraziyê." Rûp 74, nava paragrafa duyem:" Min çavên xwe li sûretên dîwaran gerandin, lê ji ber hemû meya ku min vexwaribû, ez wek keştiyek mest, keştiyeke li ser ava lehiyeke şêlûn bûm. Ji min re xuya bû ku jin û mêrên li ser afîşan ji kincên xwe derdiketin û kincên qeşmeran li xwe dikirin." Rûp 75, paragrafa yekem:" Gava ez ji trenê dakevim, bêyî ku min li navê êstegehê binihêriya, min kêr (hindik) nêzik dizanîbû ez li kîjan taxê bûm." Hey maşallah, Vebêj bi serxweşiya xwe re jin û mêran ji afîşan dixuliqîne; lê trênan tevlihev jî nake û derdê serê derdan, bêyî ku li navê êstegehê binêre dizane li ku ye; di vê navberê de, meyxane jî dibin çayxane. Heman rûpel, dawiya paragrafa duyem:" Nêzikî du sed gavî, min ronahiya restoraneke bi navê Restorana Teyrê masiyan dît." De kerem bikin, bi vebêj re em bikevin retorantê. Rûp 76, rêzika yekem: "Xwediyê çayxaneyê peyala meya sor danî ber min û got: "Ha ji te re birayê min." Min lêvên xwe di sêlavê de şil kirin û min ji xwe re got, ew de vera hanê ne xerab e." Restorant jî bû çayxane; xwedêgiravî, vebêj bêyî ku li êstegehê binêriya dizanîbû di kîjan trenê de û li kîjan taxê ye. Vebêj, bi nava xewn û xeyalan dikeve û ji me re çîroka Mîrza Miheme vedibêje. Xwe ji bîr mekin, vebêj hê li restorantê rûniştîye û çîrokê vedibêje! Ka em guhê xwe bidin vebêjê. Rûpel 79, dawiya paragrafa duyem: "Tu ê heft mîhan serjêbikî û heft kunên avê tije bikî. Her ku ez tebeqeyeke erdê xelas bikim, tu ê mîhekê û kuneke avê bavêj devê min. Mîrza Mihemed heft mîhan serjê dike, heft kunên avê tije av dike û li ser piştê Sîmir siwar dibe. Sîmir dest bi fira xwe ya bê dawî dike. Ew tebeqeya pêşîn diqedîne, nikilê xwe ber bi Mîrza Mihemed ve dike. Mîrza Mihemed jî miheke sax û kuneke av diavêje devê Sîmir." Ez ez im Mîrza Mihemed herheft mîh serjêkiribûn! Ma we nedît mîhek sax-zindî- avê devê Sîmir. Çîroka me qediya, em hê bi vebêj re, li restorantê rûniştîne. Rûp 81, paragrafa yekem:" Li çayxaneyê li derveyê Parîsê, min destê xwe ji mêrê erê re bilind kir. Min xwest ku ew piyala min dîsa dagre. Ew bi kêf ber bi min ve hat û piyaleyê tije li ber çar pêncên ku min vala kiribûn danî û got, "Vaye, birayê min." Vebêjê, sê piyale di rûpelê 72yê de vexwarin; meyxane bû çayxane; nêzî şûşeyekê jî di rûpelê 73 yan de vexwar; mirovên di afîşan de zindî kirin, lê trênan tevlihev nekir ne! Ê şêş qedeh jî -li gor gotina vebêjê, şêş piyale- li restorantê, pardon li çayxaneyê, vexwarin. Ka em binêrin, bê piştî vexwarina neh piyaleyan û nêzî şûşeyek meya sor, çawa bi ser hişê xwe ve tê. Rûp 82, paragrafa yekem:" Li restorantê, ez bi birçibûna xwe hesiyam. Hat bîra min ku min tiştê nexwariye." Heman rûpel, dawiya paragrafa duyem: "Min bi pereyên ku min ji destê jina martinîkî girtibûn pereyên wan hemû piyaleyên meya sor da." Vebêjê me bi xwe ve hat û heta pere jî ji ku girtiye bi bir anî; dawiya dawî, bêyî ku serxweş bibe, ji restoranta geh dibû çayxane û geh dibû restorant, derket.

"Seriye ku herdem ji bîr dikir", rûp 100, dawiya paragrafa sêyem:" Ez gihîştibûm Ewropaya Rojava, warê jînê, paytextê evînê. Gelo ez li Îtaliyayê bûm, li Fransayê, an jî li welatêkî ji Ewropa Jorîn bûm? Zanîna wê yek ji binî ve ji bo min ne girîng bû, lê min bawer dikir ku ez li Fransayê

bûm."Peyvek xwe dubare bikira, me yê bigota di nava 106 rûpelan de, dibe ku ji ber çavê redaktor û nivîskêr reviya ye. Lê mixabin nivîskar naxwîne; em dev ji nivîsên xelkê berdin, nivîskarê me bi xwe re nabîne ku nivîsên xwe jî bixwîne. Heman hevokên li jor, di çîroka "Qesra xewnan", di rûp 21ê de û di çîroka "Fira kevokan", rûp 85ê de, xwe dubare kiriye û li vir jî bûye sêbare. Çîrokên me qediyên serê me sax...

Nîşe: Ev nivîs di kovara hinarê hejmara dawî û malpera www.kulturname.com 02.09.2012 de weşiyaye.

XEWNEKE PAYÎZÊ

Romanûsê kurd Îlhamî Sîdar di berhema xwe a bi navê "Xewneke Payîzê" de jiyana Melayê Cizîrî digire dest. Berhema li ber dest bi cureya xwe 'romana dîrokî' ye. Nivîsîna berhemên li ser bûyereke dîrokî kar-barekî giran e, kedek dijwar dixwaze. Ger ev kesê li ser tê nivîsîn alim û şa'irê edebiyata kilasîk a kurd Melayê Cizîrî be, diwartir e. Ji ber ku daneyên nivîskî li ber destê me tune ne, ji bilî dîwana Mela; lewra karê nivîskar zortir e. Karakterê bi navê Edib Ehmed, bi eslê xwe kurd e; li Zanîngeha Dîcleyê doçent û mamosteyê edebiyata tirkî (nivîskar bi xwe jî mamosteyê edebiyata tirkî ye) ye.

Piştî sî-çil saliya emrê xwe hînî kurmançî dibe (nivîskar jî piştî sî-çil saliya xwe li kurmançî vedigere) û dikeve pey şopa Meleyê Cizîrî û dixwaze romana wî binivîsîne. Edîb Ehmed, di nav wêjehezan de kesekî naskirî ye (nivîskar jî wisa). Karakter behsa lêkolîn û lêgerînên xwe dike, hin helbestên Mela tehlîl dike û hewil dide ku zehmetiyên nûsîna romana li ser Mela li ber çavan raxîne. Di dema lêgerînê de Edîb Ehmed berê xwe dide Cizîrê û li cem Melayê bi navê Sadî dibe mêvan. Edîb Ehmed, destê sibê xewnê dibîne û di xewnê de Melayê Cizîrî ji karakter re dibêje, "Ji refika kitêban rahêjê wê pirtûkê, ew kitêba eşqê ye"; û bi vî awayî, di sibeha payîzekê de romana duyem dest pê dike. Bi gotinek din, roman di dilê xwe de romanek din dihebîne. Heta vir problêmên biçûk hebin jî mirov dikare çavên xwe jê re bigire. Êdî raste rast Melayê Cizîrî dikeve dewrê, nûser û vebêj dibe Mela û problemên cidî rû didin. Berî behsa kêmasiyên rûdanê bikim, dibê vê anekdotê bi bîr bixim: Dîwana Melayê Cizîrî, di dilê xwe yê deryayî de "hezkirina îlahî-mecazî, belaxat, gramer, estetîk, dîrok, mantiq, felsefe, tasavûf, astronomî, fizîk û metafizîkê dihebîne. Mela hakimê kalam û fîkihê ye û di heman demê de ji ehlê wahdetul vicûdê ye."



Dem a nivîskar berê Mela û xwendeyan dide Heskîfê, wêneyê bajêr li ber çavan radixîne; ji bilî vê dimenê çavê mirov bi wêneyên bi rêk û pêk nakeve. Heskîf, di bin hukmê "Melîk" de ye. Li serayê defterdar Mela pêşwazî dike. Defterdar ew qas bi kibir e ku qasî pozê derziyê hurmetê li Mela nagire. Lewra wekî Mela zarokek be bi cînavka "tu" deng li Cizîrî dike û Mela jî her dibêje, Li ser seran û çavan ezbenî. "Melîk"ê Heskîfê du-sê caran Mela vedixwîne serayê. Civata serayê wekî a Osmaniyan e; ji sifreya wan tenê şerab kê m e. Di civatê de, Mela ne wekî alimekî lê mîna

helbestkarekî ji rêzê ye. Mela li civata kêf û sefayê her helbestan dixwîne û wekî şelaf û qirdikekî hatiye pênasekirin.

Mela di zarokatiya xwe de her li dora koşk û serayan pêgermokê digerîne. Piştî vedigere Heskîfê, dîsa li dor koşk û serayan e. Di wê gerê de, Mela ji nişka ve destmalekê li ber lingên xwe dibîne; dema serê xwe bilind dike, Selmaya ku wê bi heft dilan dil bikevê li ber pacê dibîne. Piştî "Melîk" ji mela dixwaze dersa gramer û belaxatê bide keça wî, Cizîrî bi keçika li ber pacê dîtibû re rû bi rû dimîne. Bi bihurîna demê re, Mela û Selma aşiqî hev dibin û haya "Melîk" ji rewşê çêdibe, loma jî Mela diavêje zindanê. Mela di zindanê de li xwe mikur tê; eşqa fizîkî red dike û dawî li romanê tê. Ango Melayê Cizîrî tam dikemile, metin diqede. Nivîskar li vir bi zanebûn dawî li romanê tîne, ku ji bo xwe ji tîrên rexneyan xilas bike. Ger Mela nekemilî be, îja ew helbestên muhteşem çawa nivîsîn? Gelo dikeve serê kê, ku Melayekî ji rêzê were vexwendin ji bo meletiya mizgefta mezin a bajarê "Melîk"?

Kêmasiyên dî yê rû dane ev in:

1. Bi tu awayî em rastî "hiyerarşî"ya medreseyan nayên.
2. Çav û bêvila mere "atmosfer"a dewra Cizîrî seh nake. Xwende ji rabûn û rûniştandin, xwarin û vexwarin û lixwekirinên Kurdistanê bêpar dimînin.
3. Mela, ne bi îradeya xwe helbest nûsî ne, lê wekî serxweşekî bi cezbê ketibe helbest nûsî ne. Wexta bi ser hişê xwe ve tê, ji xwe bawer nake ku wî ew şî'êr lêkirine.
4. Zimanê romanê û helbesta Mela qasî erd û asîman ji hev dûr in.
5. Wekî me li jor bibîr xist, Mela hakîmê estetîk û gramerê ye. Lê romana ku nivîskêr bi Mela daye nûsîn dûtî estetîk û gramerê ye.
6. Nivîskar hewşa mizgefta mezin a Heskîfê wiha bi me dide nasîn: Rûpel 169:" ...li ber eywanê bîreke ku ji sarincê bi dewlikan av jê dihat kişandin hebû, şirrinî ji şadirwanê ku li nivê hewşa bi sivderan dorpêçkirî bû diçû..." Qasî dizanim ji her derê Heskîfê av dipijiqe. Ger av kêm be û ji bîran were kişandin, ev şirrinîya şadirwanê xwedî çî aqilî ye?
7. Dema nivîskar sûk û bazara Heskîfê dide nasîn, di orta havînê de li "fêkîfiroşan" porteqalan jî dide firotin. Havîn û porteqal?
8. Peyvên; "spas", "mamoste", "rewşenbîr", "fêrgeh", "pol" ne aidî dewra Melayê Cizîrî ne; lewra di van salên dawî de ev gotin tevî kurmancî bûne. Peyva "mamoste", piştî soranan dest bi perwerdehiya soranî kirin; di salên şêstî de ji peyvên mam û hosta darajtin û ji soranî ketiye nava kurmancî. Lewra mere dikare bi rehetî bibêje zimanê metnê ji lîteratura medreseyan dûr û bêhay e.

9. Nivîskêr, di metnê de behsa pol/fêrgehan dike. Di medreseyan de pol nîn in; lewra dersa giştî tune. Her mela-seyda berpirsiyarê şagirt, talib, suxte, feqî'yên xwe ne û piştî nimêja sibê heya nîvro'yê li gor jîrbûn û asta şagirtan yeko yeko dersa wan dide. Feqî jî piştî dersa xwe digrin li gor asta hev dikevin nava muzakereyan, digengeşin û bi şev jî di "etûd"an de dersên xwe di ber çavan re derbas dikin.

10. Metn ji hêla mantiq, rêziman, redaksiyon û edîtoriyê ve bi pirsgirêk e.

Tiştê herî ecêb ev e ku talûkeyên Edîb Ehmed bibîr dixê tev di romana duyem de rû didin.

Gotina dawî; xwezî nivîskêr ji dêvla romana duyem, eşqa Edîb Ehmed û Selmayê di bin siya dîwana Mela de pêl bi pêl li jiyana modern bilefanda, ku xwînêr hem çêjek ji helbestên Mela bigirta hem jî bi eşqa karekteran re bihejiya û reva rev berê xwe bidana dîwana Melayê Cizîrî.

Nîşe: Min agahiyên di derbarê xalên 8 û 9'an û anekdote de ji hîn nivîskar, mela û lekolînerên kurd wergirtin.


15.08. 2015 www.diyarname.com

Xewneke Payîzê / Îlhamî Sîdar / 256 rûpel / Weşanên ithaki

ROMAN-ÇÎROK A DI BIN BASKÊ WEZÎFEDARIYÊ DE FETISÎ

Di berê de ji xwendina romanên tarîxî û mîtolojîk hez dikim. Dema çavê min bi pirtûka Ronî War a bi navê "Siyabend û Xecê" ket min got ez ê îja te'amekê jê bistînim. Lê xweziya min di paragrafa ewil de li ser boçika xwe qutifi.

Di yare nivîskar mirovekî zorbihtiyar e. Qey tu divê aşît rabûye, mîrateya kurdî daye ber pêlên xwe yên gawir; û nivîskêr ji bi dilşewatî xwe avêtiye avê, bermahî ji nava lepê ava şêt xelas kiriye, bi lez û bez li ser kaxetê raxistiye. Nivîskêr, raste rast çîroka "Siyabend û Xecê" vegotiye. Ez ê bi kurtî roman-çîrok-ê vebêjim û piştê berê xwe bidim dilê pirtûkê, nakokiyên di pirtûkê de vebêjim û dawî li nivîsa xwe bînim.



Siyabend û Xecê: Piştî bavê Siyabend dimire Siyabend sêwî dimine li ber destê ap û amojinê. Ap û amojin zilmê lê dikin û Siyabendê sêwî dibe qesas û rêberekî dera hanê; serî radike çî namîne tîne serê ap û amojin û gundiyan. Pişt re bi rêya xewan, destbirakê xwe Qeregêtranê salê, dinase. Qeregêtranê salê û Siyabend dikevin pê felekê; felekê, di dilqê jinekê de dibînin û hesab jê dipirsin. Piştê ji çiyê dadikevin, Xecê li nava kon dibînin û wê ji Siyabend re direvinin çiyê. Di heman rojê de Siyabend dest û lingê Qeregêtranê salê li qeydê dixê û ji bo bûkaniya Xecê berê xwe dide bajêr. Bira û pismamê Xecê tîne Qeregêtranê me dikujin û Xecê dibin. Siyabend bê ku bûkaniyê bistîne ji bajêr bi lez û bez tê ser cendekê destbirakê xwe; piştê bira û pismamê Xecê tevan dikuje û Xecê ji xwe re tîne. Bûyera revandinê, kuştin û mirina Siyabend û Xwekuştina Xecê, di nava 24 seatan de pêktên.

NAKOKIYÊN DI PIRTÛKÊ DE RÛDANE.

Vebêj heta dawiya pirtûkê nivîskar e. Rûp,10: "Bi hêviya ku belkî xêra wî qebûl bibe, heta jê dihat xêr dikir û bi baweriya ku xwedê delîlê heyiriyar e, xwe ji xwedê nedikir!" Nivîskêr, bi devê Qasimê bavê Siyabend, ruşwetê dide xweda. Ka em binêrin, bê çawa gazin û lomeyan dike ji xweda. Rûp,11: "Te ez li vê dinyayê xuluqandim. Te malê dinyayê, xweşî û rehetî daye min, şikir ji dana te re û mala te ava be, lê te zarok neda min!" Rûp, 13: "Rahîşt misînê xwe û berê xwe da derve. Ewil destmêja xwe şikand dû re hat destmêja xwe nûh kir û vegeriya hundur malê." Diyar e ku nivîskêr tu carî limêj nekiriye - haya wî ji bayê felekê nine. Dema mirov ket xew êdî haya wî jê nîne; angû bêdestmêj e. Destmêja ku hatiye şikandin carek din çawa tê şikandin?

Rûp, 14:" Xwedayê ku erd û ezman xuluqandiye hema wê gavê duayê Qasim (binêrin duayên ruşwetkaran çî zû qebûl dibe) di cîh de qebul kir. Piştî wê sibehê bi deh pozdeh rojan pîreka

Qasim xebera xêrê gihand wî. Jina wî bi himil bû, Xwedan li wan hatibû rehmê!" Di vê serdema postmodern de, zanistî hatiyê wê radeyê ku kêma maye însanan bixulîqîne; lê heta 20-30 roj di ser bêdestnimêjiya jinê re nebore nikare himilbûnê tesdîq bike; bes nivîskarê me di pozdeh rojan de garantiyê ji xweda digre.

Rûp, 14: Paragrafa sêyem: "Di ser wê rojê re neh meh , neh roj û neh saetê jina wî qediyar. Gava ku roja wê hat Xwedê ewladekî nêr da jina Qasim." Gelo di kurdî de qey peyv nemane, ku nivîskar ji bo zarokê "kur"peyva "nêr" bi kar tîne? Qasî ez dizanim kurd dibêjin law, kur jê re bû hwd.

Ka em binêrin nivîskar şanoyeke çawa li dar dixê: Rûp, 27:" Siyabend got: Amojinê, apê min ez şandim malê! Got min li çolê bêhnek serê xwe avêtibû xewê! Xoce Xizir hat xewna min! Ji min re got mewlûdek te heye... piştî çend rêzikan. Siyabendo , de rabe bilezine berê xwe bide malê. Here gayê sor bigre û bibe malê, tu û amojina xwe gayê sor serjê bikin, bikin mewlûd û bidin xêra dê û bavê min, ez ê jî biskek din bêm..."

" Siyabend gayê sor yê cot, ku li ber dilê apê wî pir şîrîn bû, anî hewşê û çû çend kesên mîna xwe dît. Ji bona ku gayê sor serjê bikin ew bi xwe re anîn hewşê." (Siyabend zarok e, li ber destê apê û amojê ye û zarokên wek xwe tîne û ga serjê dike. Hewildide heyfê hilîne. Em berdewam bikin) Rûp, 28: " Siyabend, Xwedê mala te û apê xera bike, ma ka em li ser kîjan agirî vê mewlûda hanê çêbikin. Siyabend lê vegerand û got: Tew min ji bîr kiribû! Apê min gotibû xanîkê pêşiya malê xerab bikin..." Qey tu di divê nivîskar li berriya Mêrdînê di bin konê reş de rûniştîye, ji cemaetê re çîrokan vedibêje. Hîç nayê bîrê ku romannûsî ne karê henekan e. Ma ev hevokên li jor dikeve serê zarokê/ê? Em bînin amojin ehmeq bû (di romanê de agir jê dibare), mal li xwe miratkir bi destê Siyabend; îja qey misilmanek di wî gundî de nîn bû? Ma çawa ew xwarin (piştî ku xanî hat xwarê), di qirika şênîyên gund de çû? Erê, ve şano- senaryoya nivîskêr, tenê ji bo çîrokên zarokan dibe. 15 sal berê, dema min dibistana navîn li navçeyê dixwend, min ev şano- çîrok bi heman halî ji devê hevokê xwe bihîstibû; hê jî, her ku tê bîra min ji xwe re dibîşirim. Navê wê çîrokê jî "cil bi gû" bû. Ew jî wek Siyabend sêwî yê li berdestê apê û amojê bû.

Encam: Pirtûk, hê gelek nakokî di dilê xwe yê bi şewqet de dihebîne. Min ji bilî çîrokek bêtaqet tişteki din nedît, di nava rûpelan de.

DILYA Û ZALAR

Mirov, rengêk ji rengên milletê xwe ye. Ez jî dişibim xwediyê xwe. Ji ber ku ez dişibim xwediyê xwe. Ango ez xwe wisa dibînim, niha ez ê bi islûb û tehera xwediyê xwe dest bi pêşkeşkirina axaftina xwe bikim. Em bi van hevokên cest zêrîn ên di bêjînga edîtor û redaksiyonê re derbasbûyî, di şemûka romana bi navê Dilya û Zalar a Mîr Qasimlo re dikevin hundir. Mijara pirtûkê eşqa Dilya û Zalar a di xewnan de pêkhatî û vediguhere rastiyê ye. Nivîskar ji ber ku bi egera berpirsiyarî- jinparêzî, tohîladan-sîyasî û xwe qurbankirin-eşqê, rabûye wek melayê bi rûhiyeta îlahî li ser dikê ketiye û her di transê de maye. Xwezî nivîskar bi wan egerên min li jor destnîşan kirin re ranebûya, ji dêvla qerekeran bandor lê bikira û ew dîlbigirtana, nivîskêr û qerekeran li hev bikirana, bi awayekî azad bi hev re bimeşiyana û me jî tehmeke edebî ji pirtûkê bîstandana. Hemû qerekerên di romanê de cîh digrin di bin siya zalar de mane. Heta meriv dikare bibêje rengê wan nîne. Bêreng in. Zimanê qerekeran hema bêje yek e. Hemû qereker, bi tevî siya Zalar, Zalar vedibêjin, ne xwe. Nivîskar, di vegotin û diyaloga di nava gundiyan serhedê re derbas dibe tenê serkeftiye, diyalogên gundiyan gelekî baş zevt kiriye. Ji ber ku di romanê de gelek kêmasî, şaşî û nakokî hene ez ê nekevim dû kitekitan ji bo nivîs dirêj nebe û ji hedê xwe dernekeve. Ez ê di bin hin sernavan de minakan ji pirtûkê bigrim û dawî li nivîsa xwe bînim.

Trans:


Rûpel= 47: *Tiştta ku divê tu pê rabibî û pêkbînî, wekî min li jorê jî got.*

Rûpel= 91: *Û gotin di devê min de perçe û parî dibûn piştî ku min ew pîrsa jor jê bîhîstibû.* Ev hevok û hevokên bi vî rengî yek an du hevokbana meriv dikarî daqurtanda û bigota ji ber çavê nivîskêr û redaksiyonê reviyane. Hîç haya nivîskêr jê nîne, ku romanê dinivîsîne, ne maqaleyek analîzî. Nivîskêr, ne carek lê 90 carî her xwe dubarekiriye û ketiye dû îspatan.

Rûp= 235: *Çi dema ku min bigota dayê, çavên wê bi deh bihistan ji hev vedibûn.* Nivîskêr, xwe ji bîr kiriye, ku roman romaneke rasteqîn e û qereqter jî qopiya însanên dinyayî ne, ne hûtên mîtolojîk. Çavên qasî dendika zeytunê çawa dibe deh bihist nizanîm.

Xwe dubarekirin:

Rûp=63:*Ji ber ku gava deng li bizinê dike, raste rast navê bavê xwe hildide, zêde şerm dike. Ji ber şerma zêde baz dide diçe. Diçe lûtke çiya ku hema bi qasî pênc kilometir dûr e cîhê lê bûye. Li gor*



çîrokê, Şah Heyder gava gazî bavê xwe dike, navê wî raste rast hildide, ji vê kirina xwe zêde şerm dike û dixwaze ji ber çavan wenda bibe.

Min gotibû ez ê nekevim dû kitekitan, lê ev hevok nahêle meriv neaxive. Kîlometre bûye kîlometir. Xwe dubarekirin têrê nake, îja dibêje: carekê deng li bizinê dike, bi wê ji nasekine, dibêje: raste rast deng li bavê xwe dike. Em di pirtûkê de rastî tiştêkî bi wî hawî nayên, ku ka nivîskêr ev ji ku derxistiye, ez nizanîm.

Hizirna bi tirkî:

Rûp= 309: Li pey ku wî gotina xwe kuta kir, xwediyê min ew bi şidyayî hembêz kir. Rûp= 320: Binyada me ku mîna ya hemû giyanîyan bi sê dûrîşmeyan pêkhatiye ku; Hez bike, bijî, bide jiyandin. Rûp:506. Xanima biçûk, min navê ku tiştêk nû bêjim.

Tevliheviya mekan:

Rûp= 52: ..., yên mayî bi darê zorê şandine navçeya Xinûsê. Xinûsa Erziromê... Ez li wir ji dayik bûme. Rûp= 596: ... min ew bi derewa ku ezê biçim Tekmanê û di heft saliya mirina mêrê xwe Heyder de, li ser gora wî bîm, qanî kir, dilê wî kir cîh û... di van hevokan de em hîn dibin ku dayîka besê li navçeya Erziromê Xinûsê ji dayik bûye ango li vir cîh û war e. Di heman navçe û heman gundi de bi mêrê xwe yê bi navê Heyder re li gund zewicî ye. Lê Haya nivîskêr jê nîne ew li Xinûsê zewicine û warê wan e. Dayika besê dişîne navçeya Tekmanê.

Mafê jinan (xwe derewandin):

Rûp= 78: Yanî jin mîna niha nedihatî binpêkirin (jin an mafê jinê?). Miheqeq fikra wê dihat girtin û pê dişêwirîn. Ka em binêrin nivîskêr di rûpela 80 ê de çi dibê ji me re: Mîna niha ne azadiya aborî û ne jî mafê jinan hebû ku bi serê xwe tevgeriyana û bi gor xweziyên xwe yên hundirîn tevli jiyane bibûna û bi reng û xeyalên xwe bijiyana.

Ka em binêrin Besê (70 salî ye) ya xwenda çawa nexwende dibe:

Ji bo nivîs dirêj nebe ez ê hevokan kurt binivîsînim. *Rûp=130: Min divê bêjim ku gava min nameyên wî di navbera pêşî û bersingê li ber pêşîrên min bû de bi cîh fikir û bi wi awayi ew dibirin ser kaniya gund û cihê goncal û bi hêdîka ji hevalên xwe re dixwendin. Rûp=168: min hevokên jor bi hestek kûr xwendin. Rûp= 602: ... niha dikarim li xwe mikûrbêm ku erê min qet nexwendiyê lê ez bi têra xwe geriyame û... Xwendeya me gihîşt heqê xwe. Gelo bersing tîn ber çavan û nivîskar bi gûman e her xwe li pêşîran şidandiyê?*

Bêhayîbûna nivîskêr ji şert û mercên roman lê diqewime. Roman romanek rasteqîn e; van 70 ê salên dawî vedibêje; bi gotinek din, doh û îro ya me ye.

Rûp=130: *Di nameyên xwe de behs dikir ku ji bo min pênc cûre parfûm, sê cûre bersing û çar jî derpik kiriye û gava min bibe ba xwe, ew ê bi xwe wan li min bike, bi xwe ji min derêxe û parfûman biresîne ser cestê min ê tezî kirî û paşê di paxila min de vezele.....* Ev gotinên Dayika Besê ne. Besê niha heftê saliye û di 16 saliya xwe de mêr kiriye; bûkek gundî ye, mêrê wê jî çûye Almanyayê û ev name jê re şandiye. Besê, besh 50 sal berê dike. Heta bîst û pênc sal berê li gundên Erziromê ceyran tunebûn. Name li ser navê bavên dihatin tenê ji silav û kulav di xwe de dihebandin. Feqiriya wan salan de derpê bi destê kesî nediket lê Besê ketiye nava fantazyên ji serê xwe mezintir. Di rastiya xwe de ev gotin ne yên Besê fantazyên nivîskêr bixwe ne.

Rengê mor:

Rûp=450: *Em di texsiyek mor de bûn kurê min. Ji boyaxa erebê bigre heta rûyê palkursiyên em lê rûniştibûnjî mor bû. Erd, asîman, ewrên, riya ku em tê re diçûn, stêr û tav, dilên me, xwîna me, kenên me, bêrîkinên me û lihevmezêkirinên me yên evînbar hemû morbûn. Mor mor mor..... Gerdûnek bêhed û bêhudûd a bi rengê mor ve xemilî... Bavê te li ser kursiya ajovanî rûniştî bû. Kurtikek spî û reş û şalek qot ê rengqehweyî li ser bû. Gelo rengên din tev bi ku ve çûn? Ev hukmê mor ji ku tê? Gelo di nava vê morahiya zulmat de rengên din dikare were dîtin? Yan jî, madem hemû reng mor bûn, îja çawa Kurtikek spî û reş û şalek qot ê rengqehweyî li ser bû*

Krîza derûnî a Dilyayê:

Nivîskêr ji rûpelê 439 an heta yê 444 an, vê mijara derûnî a venîşiyê ser Dilyayê, bi devê Dilyayê vedibêje. Dema Dilya halusînasyona Mîr Zalar dibîne êdî ji ber rewşa evîna îlahî (a ku di xewnan de pêktê) derûniya wê têk diçe; li kolana Aksaray a herî şên xwe wenda dike û çî tê ber devan ji Zalar re dibê; dide çêran xeberên nemayî jê re dike. Piştî, Dilya hê di wê rewşa kaotîk de ye, kalek tê bi milê Dilyayê digre û jê dipirse: Qîza min kê tu tacîz kir ka di nava vê şênîyê de ravî min bide tiştê nemayî em bînin serî wî. Piştî deng bi şênîya li Dilyayê civiyaye dikeve; her kesek tiştêkî bi tirki dibêje, di derbarê rewşa heyî de. Gelo wan tirkên kurdî nezan çawa ji kurdiya Dilya yê fêhm kirin? Ma zimanê wê eşqa îlahî (an destanî) ne bi kurdî ye? Ger Dilya bi tirki axivî be divê were pirsîn; ma Dilya ne ewkeçika di hefsaliya xwe de ji bo ku zimanê dibistanê tirkî ye, hêrs dibe û di serencamê de dev ji dibistanê berdide; Dilyaya niha di dilê wê de eşqa efsaneyî dinive, ma xebatên xwe yên femînîstî hê ne bi kurdî dimeşîne?

Peyv:

Rûp=409: *... Dilya rabû ser xwe delingê eteka li ser xwe hinek dan hev û bi rêveçûnek dildaran e ve hat bi hevraz li ser min rûnişt....* Gelo ji kengê ve ye pêşa etek bûye deling? Şal, eşofman, şalwar hwd bi deling in, ne etek. Etek xwedî pêş e.

Rûp=58: *Ji ser zewaca me re tam çar sal derbas bûbûn û hê ez avis nemabûm.* Nivîskar vê peyva avis ya eletewş ne bi devê keçek îro lê bi devê pîrek 70 salî a serhedî dide gotin. Nivîskar gelek

baş dizane, ku serhedî tu carî peyva avis ji bo jinê bi kar nayne, tenê ji bo sewalan bi kar tînin. Gelo qira van peyvan hatibû ku nivîskar çû peyva avis bikar anî: Bi hemil, ducan, bi zaro, zik li ber dev, bihalekî hwd.

Rûp=519: *....piştî ku min bi dayik, bav û bira û herdû xwîşkên xwe re xurîniyek xweş xwar...* Em ji vê dîmenê fêhm dikin û wan taştê ya xwe xwariye ne xurînî. Ji ber ku xurînî ne taştê ye beriya taştê an vexwarina iskanek çay an jî avêtina ber dil a gepek nan e, ji bo kişandina cixareyekê, hwd.

Pirtûk, hê bi sedan kêmasî û çewtiyên wek minakên min li jor dan, di dilê xwe yê kaotik te dihebîne; bawer im hewce nake wan yeko yeko binivîsînim. Hîç behsa rastnivîs û rêzimanî nakim; ew bi serê xwe mijareke dî ne; gelek peyv ji wan hatine kirpandin, an jî şaşiyên tîp î hene.

Encam: Di bin siya wan mînakên heta niha min dayî de, bi dilekî rehet dikarim bibêjim; roman, çawa ji ber destê nivîskêr pekiya be derê weşanxaneyê, weşanxaneyê jî, bê ku serê xwe bi edîtorî û redaksiyona wê re biêşîne, raste rast şandiyê çapê. Gelo eceleya weşanxaneyê çi bû? Weşanxaneyê ji bo reklama xwe, nivîskar û pirtûk kiriye qurbana xwe. Mixabin Dilya û Zalar di bin siya "Giyanebahozî" de eciqiye.

Têbinî: Van hevokan jêr ji bilî nivîskêr diyarî kesên keda xwe danê ve pirtûkê dikim: Rûp=537: *Paşê min ji Dilê bihîst ku tiyê wê bi mebesta kuştinê lêxistiye.* Rûp=538: (ji Dilê re dibêje) *De law îja ez û bavê te em ditirsin ku ev jinik bi mêt be û dibetiya herî xerab û tirsnak jî eve ku ew ji mala xwe reviyabe.* (ka em binêrin piştî 5 rêzikan wê çi biqewime)... *ji vê gotina wê em dikarin têbigihjîn ku ev jinik bi mêt e.*

Dîroka nivîsê: 2012

Dilya û Zalar

Mîr qasimlo

Weşanxaneya AR

HER R BI QASÎ QILÊRA XWE SPÎ YE

Dilgeş, Sozdar û Roza, qareqterên sereke yên romana Omer Dilsoz a bi navê “Bêhna Ax”ê ne.


Dilgeş: Kurdek nivnivîskar û nû ji zindanê derketiye hewil dide bi jiyana piştî zindanê re li hev bike ango bijî lê jiyana guheriye hiç tiştêkî wekî berê nemaye û evîndarê Roza yê kevin e û hêj di dil de agir geş e. Dilgeş di heman demê de kesek sêwî ye.

Sozdar: Şervanek birindarî dîl ketiye, piştî dîl ketinê her cure îşkence û xerabî li ser bedena wê hatiye ceribandin. Ji ber îşkence û êşa birînê piştî salan ji neçarî li xwe mikur tê û dibe îtîrafkar piştî demek serbest tê berdan. Ne dê maye ne bav û ne bira tevan dema li çiyê bûye ew red kirine. Li starek digere e.

Roza: Evîndar û berdilka Dilgeş lawikê gundî ye. Bi destê dê û bavê xwe bi kalek dewlemend û nemêr re hatiye zewicandin. Xwedan bijiyek (pîç) ji tiyê xwe yê bi navê Edo ye. Wekî ji tabloya jor jî diyar e qareqterên me tev binketîne di rastiya xwe de em bixwe ne. Omer vê mijara nazik digre dest û tevnê xwe dirêse û rêya hersê qareqteran li bin banê apartmanek digihîjîne hev. Kurt û kurmancî çîroka romanê ev e, ez bawerim hewce nake em bêhtir veçirin çîrokê.

Ji vir berî 5 salan min ev romana mişt ji peyvan hatiye dagirtin ji ber bişaftina gawir min bi darê zorê xwend, ez mecbûr bûm her rahêjim ferhengê û peyvên min hiç nebihistîbûn hîn bibim û bixwinim. Niha piştî pirtûkên berdestê min qediyar min berê xwe da nava refê pirtûkên xwe yên hindik lê rindik û çavê min li ser hersê romanên (Hêviyên birindar, Bêhna axê û Neynika Dilî) Omer Dilsoz sekînin. Piştî mêzekirinek kurt min rahişt romana duyem ango Bêhna Axê û lê çerixî...

Omer wekî mêşhingivek ji dilê ferhenga xwe ya dewlemend mêtîye û tûrikê xwe yê ji peyvan dagirtî xelek bi xelek bi hev ve girêdayî li ser rûpelan raxistiye û pêşkeşî me kiriye. Omer piştî xwe daye axê ango gund û wekî kalek dewra berê ji xwe bawer tevna xwe dirêse û di vê navberê de jî guhê xwe li ser ahenga dengên hevokan de bel kiriye. Diyar e nivîskar gelek li ser berhema xwe xebitiye, gelek caran di ber çavan re derbas diriye. Derûniya qareqteran xweş zeftkiriye. Bê ku qareqterên xwe yên ketî (li gor civaka heyî) sûcdar bike û bikeve dû reşkirina wan bi awayê siyasî. Bi xwe li xwe mikurhatina qareqteran re tawanê cîvakê li bin guhê erdê dixine bela wela



dike û dibêje tu kes ne pîroz e. Ne qareqterên xwe serberjêr dike û ne jî wekî xwedayek dide nasîn. Bi kurt û kurmancî dibêje; her rû qasî qilêra xwe spî ye. Ji ber êş û trajediyên gelek caran mûyên canê mirov wekî strî radipelikin û merû ditevize. Hin caran jî bi şewheta qareqteran ve li ser sêla sor dibirije hin caran jî di nava atmosfera romantîk de merû digevize. Ken, girî û poşmaniya jiyana ji dest çûyî serdest e carnar. Rê gelek caran li ber wan tê girtin lê qarekter her di tarîreşkê de xwe li çirûskan digrin û dijîn, li berxwe didin.

Ma gelo di pirtûkê de hîç lawazî nîn e bêguman hene û ezê li gor xwe wan rêz bikim.

1. Qey tu divê leza qareqteran heye gotinê ji devêhev direvînin.

2. Di dema diyalogan de nivîskar xêzek bikarneaniye û bi diyalogan re nivîskar dikeve nava axaftinê, ev jî mirov aciz dike. Ez bawerim ev jî ji ber teknîka nivîskar bikaraniye re têkildar e.

Mînak:

“Ez jî ditirsim Sozê” got Dilgeş,

“Çii?” bi xwînsarî pirsiyar kir wê û dûre lê zêde kir.

“ Ji tirsarî te” bi dilsarî got Dilgeş

“Çawa?” pirsyareke din kir Sozdayê....

3. Ji bilî çend car dengê Roza yê hîç dengê jinane tune ne an jî ez ji ber atmosfera heyî li newarqilime.

4. Hemû qareqter ji hev baqiltir û têgihîştîtir in, ev jî dibe ku ji ber êşa jiyana pêk were . Zimanê vebêjêr û qareqteran hema bêje yek in.

Encam: Bi tevî kêmasiyên min li jor vegotin pirûk hêjayî xwendinê ye. Min bi kêfxweşî di sê şevan de xwend. Pirtûk bi serbilindî dibêje ez jî hema li diwana bilind a romanên kurmancî a heyî de. Roman li benda xwendina xwînêr jêhatî û veçirandina rexnekaran e. Ez bawerim pirtûk hê ji bê bikaranîna ferhengê xwe nade xwendin.